

### Keda jinan

Êş û berdêla her demên zehmet jin dijîn. Ev krîza di asta dinyayê de, berhema aqilê mêrê serwer e. Ew aqilê ku xwezayê, zindiyan, jinê û civakê qir dike, dibe sedema krîzên kurewî. Di vê pêvajoyê de jinê hêj baştir û bi hewleke şênber hêza xwe kire yek... *Adar Şaman / R.2*



### Nameyeke derengmayî

Zimanê min, çiyayê min, diya kurê xwe, min nebibexşîne! Ez im, ev ê ku ji te sirgûnkirî û bi zimanê biyanîyan perwerdekirî. Ez im, ev ê ku jiber pişaftin û xwepişaftinê şerm dike û şerma xwe vedişêre li ber neynika te... *Mîrza Metîn / R.5*



### Klamek Ji Bo Beko

Fîlmê Klamek Ji Bo Beko ji bo sînemaya kurdî fîlmekî serkeftî û girîng e. Lê fîlm di nav atmosfera sînemaya kurdî de kêm tê naskirin û heqê fîlmê nayê dayîn. Fîlm bi çend taybetiyên xwe hin hîmên rasteqîniya nû ya îtalî jî dihewîne... *Ferat Kevir / R.11*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

18 - 24 Gulan 2020
Hejmar: 22
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Dagirkeriya dubare



Xêrnexwazên ku Kurdistan dagir kirine, tehemulî hebûna kurdan nakin û bênavber dagirkeriya xwe rojane dikin. Şaredariyên ku bi dengê gel hatine bidestxistin, bi darê zorê desteser dikin, alên xwe dadileqînin û sirûdên xwe dixwînin. Di roja Cejna Zimanê Kurdî de vê carê jî şaredariyên Îdir, Sêrt, navçeyên Misirc, Xana Hewêl û Vartinîsê desteser kirin. Deriyên malên hevşaredaran şikandin û hevşaredar binçav kirin...

RÛPEL - 3

## Meseleya parastina ziman barekî giran e

Kurd bi salan e ji bo zimanê xwe têdikoşin û li dijî her cure zext û zordariyan zimanê xwe gihandin van rojan. Nivîskar û zimannasê kurd Samî Tan têkildarî rewşa ziman û xebatên Tora Ziman û Çanda Kurdî pirsên rojnameya me bersivand. Tan wiha axivî: "Axivêrên kurdî her roj kêmtir dibin, bi taybetî rêjeyeke zêde ya malbatên kurd zarokên xwe hînî zimanê kurdî nakin. Lewma jî pêdivî bi xebateke domdar û kedeke zêde heye. Bi rastî jî meseleya parastina ziman barekî giran e, divê her takekesê/a kurd di vî warî de destê xwe bixe bin bar. Meseleya ziman meseleyeke giran e, xebateke berfireh û girseyî dixwaze."... *Hevpeyvîna Zekî Gurur / RÛPEL - 4*

### Helwesta meclisa Tirkiyeyê

## Kurdî qebûl nekirin

Îsal, Cejna Zimanê Kurdî ji her salê cudatir bi awayekî online hat pîrozkirin. Parlamenterên HDP'ê bi munasebeta 15'ê Gulanê kurdî birin rojeva meclîse. Lê meclîsê pêşniyazpirs, pêşniyazlêkolîn û pêşniyarqanûnên bi kurdî qebûl nekirin... *RÛPEL - 3*

### Wate: Îro û Do

Helbesta zimên heye, her ziman rîtmek û olaneka xwe heye. Her ziman xwediyê qadek ji qada wateyan e û ne bi peyv û hevokan an jî bi taybetmendiyên xwe yên gramatîk, lê bi vê qadê dibe zimanekî cuda ji yên dî. Heke wisa be, em ê çawa têbigihên? Heke her ziman xwediyê qadeka wateyî be, pêkan e em bi hînbûn an jî bi wergeriyê wan dengan bibihîsin? Gelo deriyê zimanan heya taqê piştê vekirîne?... *Selîm Temo / R.5*

### Divê em bitirsin carna

Erê em kurd bêtîrs û zîrek in. Di şeran de leheng û wêrek in. Ev yek ji aliyekî ve cihê şanazî û serbilindiyê ye ji bo me kurdan. Ji dîrokê heta îro tişta herî zêde pesnê kurdan pê tê dayîn ev e. An ku wêrekiya kurdan a di şer de ye. Lê divê em bitirsin carna. Em ji çi bitirsin; ji hevkuştinê, ji polîtîkayên dikevin xizmeta neyaran, ji hewlên parçekirin û dûrxistina me ya ji hev, ji neguhdarkirna hewar û gaziyên me yên yekitî û hevgirtinê... *Reyhan Îke / R. 8*

### Meha Remezanê

Bawermendên hêja û bi rûmet maşala îsal rojî pir xweş derbas dibe, mirov bi xwe nahise hew te dît bû êvar. Mirov ne tî ne jî birçî dibe. Vaye nîvê rojiyê derbas bû hîna germahî nehatiye. Bi rastî em îsal gelekî ji meha remezanê razî û memnûn in. Min wiha got serpêhatiyeke Behlûlê Dîn hat bîra min. Ereb dibêjin Ciha, tirk dibêjin Xoce Nasrettîn û kurd jî dibêje Behlûlê Dîn an jî Behlûlê birayê Harûn el Reşîd... *Dildarê Amedê / R. 10*

**Tofaneke bê Nûh: Heskîf...** RÛPEL - 12



## Bajaroka Awîskê

Di dîroka Awîskê de şopeke êzdiyatiyê ya xurt heye. Demekê bi navê Awîskêya Elî Tem hatiye binavkirin. Elî Tem Nebiyê Mîrza Axayê mezin e. Li gorî salixdayînan, dema êzdî koçber nebibûn û welatê Xaldiyan hêj şên bû... *Ayhan Erkmen / R.8*

## Pîr û kal tenê hiştin

Welatên ku herî zêde ji vîrusa koronayê bi bandor bûn Amerîka, Îngilistan, Îtalya, Spanya û Fransa ne. Gelek beşên civakê ji pêvajoya vîrusê bi bandor bûn. Feraset û hişmendiya serdest di vê pêvajoyê de bêtir pîr û kal kirin hedef, bi tedbîrên xwe ji civakê dûr xistin û ew terkî mirinê kirin. Civak, ji aliyekî ve ji hêla vîrusê ve û ji aliyekî din ve jî ji hêla pergala serdest ve hat dorpêçkirin. Pergala serdest a dixwest civakeke ezperest biafirîne bi vîrusê gihaşt armanca xwe... *RÛPEL - 7*

## Korona, tenêtî û vegera li xwe!

Em ji bîr nekin, reva ji tenêtiyê ji nexweşiyên pandemîk sosretir e! Ji lewre divê em carna li xwe vegerin. Ev veger dê nexweşiyan ji me dûr bixe. Divê em ji bîr nekin ku tenêtî û mayîna bi serê xwe di ser zeman de ye, em bi vî awayî dikarin wî dilê hişk hinekî nerm bikin... *Ardîn Dîren / R.6*



# Keda jinan û korona



Adar Şaman



**Êş û berdêla her demên zehmet jin dijî. Ev krîza di asta dinyayê de, berhema aqilê mêrê serwer e. Ew aqilê xwezayê, zindiyan, jinê û civakê qir dike, dibe sedema krîzên kurewî**

Vîrusa koronayê bi xwe re krîza kurewî ya aborî û tenduristiyê anî. Pandemî bi xwe re cudakariya zayendî, çînî, nijadî û civakî ya heyî di vê pevajo de kurtir kir. Di hemû qadên jiyanê de ked û berhemên jinê nehate dîtin.

Kedxwariya mêr a li ser keda jinê dike, her ku diçe hîn baştir tê dîtin û famkirin. Keda jinê, ya haveynê çavkaniya madî/manewî û perestegha civakê ye jî nehate dîtin.

Pîvanên civakbûnê li ser vê keda herî pîroz ava bûye. Desthilatî li ser ked û hilberîneriya jinê saz bûye. Di dîrokê de koletiya yekemîn li ser jin û keda wê bi pêş ketiye. Metingerî û hiyerarşiya yekemîn li ser nirxên jinê hatiyê sazkirin û pergala jinê, bûye hedefa şaristaniya navendî. Bi avakirina pergala mêr- serweriyê re, keda jinê hatiye înkarkirin, tune hatiye hesibandin û biçûkkirin.

### Hêza avakirinê

Jin, her ku têkoşîn, zanebûn û rexîstina xwe mezin dike, êrîşên pergala desthilatdar jî li ser nirxên jinê zêde dibin. Lê êdî jin jî ne jina berê ye, di jiyanê de xwedî gotin, biryar, hêz û çalakî ye. Di sedsala 21'emîn de hêza nasname û sekna vîna azad e. Jin, xwedî hêza avakirinê ye. Her ku têkoşîna jinê ya li hember statûya koledarî û paşverûtiyê bilind dibe, qada jîna azad jî fireh dibe.

Wekhevî û mafê hevjiyana azad a jinê di bin xeteriyê de ye. Jin, ji aliyê hesabxwestin, lêpirsîn û lêgerîna azadiyê de bi peş dikeve. Destketiyên nû bi dest dixe. Jin, bi israra mezinkirina rexistinê qada jiyanê ya aîdê xwe her diçe mezin dike. Bi qasî berdêlên giranbuha, mohra xwe li serketinên mezin dixe. Nexasim jî, di parvekirina pêdiviyên jiyanî de jin û keda jinê di asta fedekariyek mezin deye.

Di rojên zor-zehmet de û serdemên qeyranên aborî, siyasî û civakî de her tim ya fedekarî jê tê xwestin jin e. Îro jî, li cîhanê krîza pandemiya vîrusa koronayê tê jiyîn û dîsa ji jinê tê xwestin ku barê vê pevajoya xêrnexwaz deyne ser milê xwe!

### Aqilê mêrê serwer

Êş û berdêla her demên zehmet jin dijî. Ev krîza di asta dinyayê de, berhema aqilê mêrê serwer e. Ew aqilê xwezayê, zindiyan, jinê û civakê qir dike, dibe sedema krîzên kurewî. Di vê pêvajoyê de jinê hêj baştir û bi hewleke şênber hêza xwe kire yek.

Modernîteya kapîtalîst, qeyrana di asta cihanê de berbelavbûyî weke firsendê bi kar tîne. Keda destê jinê, hilberîn, afirîneriya hevjiyana jinê tim di bin êrîşê de ye. Di vê dema pandemiya Covid-19'ê de qirkirina li ser jinê ya fizîkî, çandî, derûnî, tenduristî, aborî û keda jinê giha asta herî mezin a cihanê. Tundiya li ser jinê li seranserî cîhanê hem zêde bû û hem jî keda jinê ya di van rojên krîzê de da, nehate dîtin. Tê xwestin ku jin, di her hêlê de fedekariyê bike, lewma heqdest û keda wê jî nayê dîtin. Hat xuyakirin ku modernîteya kapîtalîst bi kêrî ewlehî, tendirûstiya jin û zarokan nayê. Di qada tendurîstiyê de yên dixebitin ji sedî 70'ê wê jin e. Lê ji hela ked û tenduristiyê ve, ti ewlehiya jinê nîne. Çawa ku keda jinê ya li malê weke kedê nayê dîtîn, keda wê ya li qada tendurîstiyê jî weke kedê nayê hesibandin.

Kesên bi şewba koronayê dikevin piraniya wan li malê tên tedawîkirin; kar û xizmeta van nexweşan jin dike. Kesên temen mezin ên xwe ji ber vîrusa koronayê tecrîd kirine jî li benda mirinê hatine hiştin. Dîsa di vê dema krîzê de dibistan hatin girtin û zarok li malê ne. Ji bo perwerdeya zarokan elaqedarî lazim e. Ev jî tê wê wateyê ku jin bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû ye. Aqilê mêrê serwer ji bo çareserkirina pirsgirêkên malbatî naxebite, hebe nebe divê gotina wî were esasgirtin. Di ber karê malê de tenê jin berpirsiyar tê dîtin û karê malê tenê weke yê jinê tê dîtin. Jixwe weke kar jî nayê hesibandin...

### Tundî zêdetir bû

Tê gotin ku pevajoya vîrusa koronayê di pergalê de gelek guhertin çekirin. Lê em dizanin ku tundiya di nav malê de ya li ser jin û zarokan zêde kir. Jin di van rojan de, hem krîza kurewî hem ya mêrê kujer dijî. Piştî pakêta qanûna înfazê ango efûya ji bo alîgirên AKP û MHP'ê hate derxistin, diz, kujerên jinan, tecawizkar û mafya hatin berdan û bi vê yekê re êrîşa li ser jinê du qat zêdetir bû.

Şîdeta hevjin, bav, bira û dewletê ne bes bû, îca di ser de jî xizanî-feqîrî û bê karî hat. Ev jî bû sebeb ku bi dehan jin bên kuştin yan jî ji bo xwekuştinê neçar werin hiştin.

Jinên bê kar man ango ji kar hatin derxistin jî, di aliyê derûnî û civakî de êdî nema karîn debara xwe bikin. Desthilatdar ji jina afrîner ditirse.

### Xetere bi dawî nebûye

Li hember şewba Covid-19'ê, têkoşîn di kar û xebatê de bi hişmendiya zanebûna jinê hat meşandin. Sazî, tevger, komele, kesayet û civaka jinê di vê pêvajoyê de hêza têkoşîn, berxwedanê û di xwedî-derketina li nirxan de hestên xwe kirin yek. Dabeşînek xwezayî di navbera saziyên jinan de pêk hat. Ev yek jî encama keda têkoşîn û ezmûna bi hezarê salan e. Xeteriya şewbê, li ser mirovahiyê hîn jî bi dawî nebûye û berdewam e. Îroj ji her demê zêdetir pêdiviya mirovahiyê bi aqilê jinê yê hestiyar, sekna wê ya polîtîk, çanda parvekirinê û hevjiyana azad heye. Ji ber ku têkoşîna jinê azadiya civakê ye.

---



Biyan

Munewer Azizoglu Bazan

## Dueta "Las Panderas " û "Ya talêel al-jabal"

Hefteya derbasbuyî dueteke du hunermendên jin di medyaya civakî de bala gelek mirovan kişand. Duet ji du stranên erebî û îspanyolî pêk dihat. Li gorî agahiyên der barê çîrokên stranan de hatin belavkirin, strana erebî ya bi navê "Ya talêel al-jabal" (Stranbêj Terez Slîman) tê wateya "ey kesên derdikevin çiyê" . Tê gotin ku di destpêka sedsala 20'emîn de, hîn dema Filistîn mandaya/koloniya Brîtanyayê bûye, jinên filistînî ji bo girtiyên zindanê vê stranê, li pêş zindanan stirîne. Paşê ev stran bûye yek ji sembolên tekoşînê ya li dijî dewleta Îsraîlê. Heta jinên filistînî hin peyamên veşarî di nav gotinên stranê de belav kirine û bi vî awayî peyamên xwe ragihandine girtiyên di nav zindanên Îsraîlê de ne. Strana bi navê "Las Panderas" (Stranbêj: Sofia Adriana Portugal) îspanyolî ye û tê wateya "nanpêj". Dîsa li gorî agahiyên tên nivîsandin, ev stran straneke gelêrî ye, jinên nanpêj dema hevîr çêkirine û nan pijandinê ev stran bi hev re stirîne. Ew rîtma herdu hunermendan bi destên xwe wek amûreke muzîkê bi kar tînin, sembola hevîrstirînê bûye.

Dema mirov herdu stranan cuda cuda û ji kesên din guhdar bike, bi her awayî – awaz û muzîk- wek du stranên ji hev cuda derdikevin pêşberî me. Her weha di gotinên stranan de jî mirov nikare hevkariyek an jî şibandinek bibîne. Strana erebî behsa şoreşgerên filistînî dike û wan vedixwîne çiyê, û balê dikişîne ser tekoşîn û her weha zilma li zindanan. Strana îspanyolî ya bi navê nanpêj bi vegotina jinan behsa nanpêjekî mêr dike. Di vê çarçoveya naverok û vegotina stranê de tenê xaleke hevpar heye, ew jî ev stran ji hêla jinan ve ji bo mêran (yên têkoşer û nanpêj) hatine vegotin. Di kevneşopiya me ya stranên kurd û kurdî de jî bilêvkirin û veguhastinên serpêhatiyan –çi civakî, dîrokî an jî evînî- wek mînaka niha, dengbêj giranî jin in. Pezindayîna mêran jî ne mijareke kêmber e.

Lê çîrok an jî sedema van herdu stranan gihandiye hevdû çi ye? Hin kes balê kişandine ser hest û çanda jinan, ku zimaneke gerdûnî û hevpar di nav xwe de dihewîne. Bi rastî jî di hunera wan de ya mirov herî zêde dikişîne xwe, ahenga awaz û muzîkê ya bi her awayî ye. Mirov dikare têkiliya dîrokî ya ereb û îspanyoliyan jî wek sedem nîşan bide. Lê hunera bingehîn a vê stranê li gorî min, ku du ziman û herêmên rojavayî û rojhilatî digihîne hevdû, awayê "stirîna" stranê û hevîrê ye. Di kurdî de lêkera "stirîn" him ji bo hevîr-çêkirinê û him jî ji bo stran-bêjiyê tê bikaranîn. Bêyî li ser bingeha wê ya etîmolojîk hûr bibim, dixwazim di çarçoveya vê mijarê de balê bikişînim hevdengî û hemwateya peyvê û wateya wê ya ji bo têkoşîna jinan.

Di nîqaşên der barê têkoşîn û mafên jinan de tespîta dibêje, "jin" ne wekhev in û tecrûbeyên wan ên bindestiyê ji hev cuda ne, mohra xwe li teorî û pratîkên hemî femînîzman û tevgerên jinan xist. Rengdêr û navdêrên pişt peyva 'femînîzman', yên wek "spî, reş (black), postkolonyal, rojhilatî, rojavayî, û hwd." bi mebesta binxêzkirina van cudahiyan tên bikaranîn. Ligel hin helwestên bi tu awayî yekbûna tekoşîna jinan gengaz û heta rast nabînin, di rewşa niha de gelek tevgerên jin û femînîstan ji bo "têkoşîneke hevpar" li dû rê û rêbazan digerin. Û dibêjin "her çiqas tecrûbe û serpêhatiyên me yên bindestî û baviksalariyê ji hev cuda bin jî, di dawiya dawî de em hemî bindestên vê pergalê ne. Lewre baviksalarî bêyî navber bixe nav, hemî jinan wek dîlên xwe dibîne. Ji ber vê sedemê ye ku divê "jin" ji çi rengî, welatî, olî û çandî dibin bila bibin, xwe bigihînin hevdû." Di vir de ev herdu stran (duet) û stirîn wek mînak dertên pêşiya me. Du jinên ji du çandên cuda, herêmên cuda, zimanên cuda di stirîna hevîr de û stranê de digihîjin hevdû. Dibe ku hevîr-stirînê wek karê jinê dîtin ne di cih de be, lê ger em dîroka çandinî û nîştecîhbûnê bişopînin, îhtîmaleke mezin em ê leqayî destara jinê werin. Stranên me ji hev cuda bin jî, ji heman çavkaniyê dertên. Û huner ew e ku mirov (jin) karibe vê cudahiyê wek rîtma stirîna hevîr bike yek-tevgerî û yek-dengî.

# Kurdî qebûl nekirin

Parlamenterên HDP'ê bi munasebeta 15'ê Gulanê kurdî birin rojeva meclise. Lê meclisê pêşniyazpirs, pêşniyazlêkolîn û pêşniyarqanûnên bi kurdî qebûl nekirin

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê zimanê kurdî ku bi milyonan kurd pê diaxivin, li saziyên dewletê qedexe ye û pê xizmet nayê dayîn. Her liv û tevgera ji bo kurdî çêdibe ji hêla dewletê ve tê astengkirin û cezakirin. Ji hêla fermiyetê ve bi tu awayî zimanê kurdî nayê nasîn. Li Meclisa Tirkiyeyê axaftinên bi kurdî tên kirin weke zimanê "nayê zanîn" derbasî qeydan dibe.

Li gel van astengî û zehmetiyên ji hêla dewletê ve ji kurdan re tên derxistin jî kurd li bakurê Kurdistanê xebatên xwe yên ji bo kurdî didomînin. Di nav salê de kurd ji bo zimanê xwe gelek bername li dar dixin û bal dikişînin ser zextên li hemberî zimanê xwe. Yek ji rojên ji bo kurdî gelek bername tên lidarxistin jî 15'ê Gulanê Roja Cejna Zimanê Kurdî ye.

**Pîrozbahiyên Online**

15'ê Gulanê 14 sal in weke Roja Cejna Zimanê Kurdî tê pîrozkirin. Di sala 2006'an de Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), bi munasebeta dîroka weşandina Kovara Hawarê ya bi tîpên latînî 15'ê Gulanê weke Roja Cejna Zimanê Kurdî îlan kir. Ji vê salê ve li seranserê Kurdistanê 15'ê Gulanê ji aliyê kurdan ve bi coş tê pêşwazîkirin û kurd ji bo zimanê xwe gelek bername li dar dixin.

Ji ber vîrusa koronayê gelek bernameyên her sal ji bo Cejna Zimanê Kurdî dihatin lidarxistin, îsal nehatin lidarxistin. Pîrozbahiyên 15'ê Gulanê îsal bi pêşengiya Tora Ziman û Çanda Kurdî li ser platformên medyaya civakî hatin kirin. Li gel ku çalakî bi awayekî online hatin



lidarxistin jî gelek kesan eleqe nîşan da û bername şopandin û parvekirin.

Pîrozbahiyan, di 13'ê gulanê de bi Konsera Ma Mûzîkê dest pê kir. Piştî konserê, bi destnîşakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî, li ser paltformên medyaya civakî yên gelek sazî û rêxistinên kurdî çalakiyên online yên wekî konser û panelên li ser ziman, wêje, folklora kurdî û tifaqa kurdan hatin li darxistin.

**Ziman hebûn e**

Ji bilî pîrozbahiyên ji aliyê Tora Ziman û Çanda Kurdî ve li ser paltformên medyaya civakî hatin kirin, KNK, KCD, DBP, HDP jî di nav de ji aliyê bi dehan rêxistinên sivîl û partiyên siyasî yên kurdan ve têkildarî 15'ê Gulanê daxuyanî hatin dayîn. Hemû rêxistin û partiyan, di daxuyaniyên xwe de bal kişand ser zext, astengî û zehmetiyên li hemberî zimanê kurdî.

Rêxistinan desntîşan kir ku ziman hebûna mirovan e û bi têkçûna ziman re mirov jî têk diçe û bang kir ku hemû kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û ji bo jiyandina kurdî bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin.

**Bi kurdî pirs kir**

Ji bilî Gunay, 22 parlamenterên HDP'ê jî bi munasebeta Cejna Zimanê Kurdî bi kurdî û tirkî pêşniyazpirs, pêşniyazlêkolîn û pêşniyazqanûn dan serokatiya meclisê. Parlamenteran, xwest ku zimanê kurdî weke zimanê duyemîn ê fermî bê qebûlkirin û 15'ê Gulanê jî bi awayekî fermî weke Cejna Zimanê Kurdî bê îlankirin. Lê meclisê bi hinceta kurdî hatine nivîsandin pêşniyazpirs, pêşniyazlêkolîn û pêşniyazqanûnên HDP'iyan qebûl nekirin.

### Bi 88 pirsan kurdî bir rojeva meclisê

Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay bi wesîleya 15'ê Gulanê Roja Cejna Zimanê Kurdî zext û astengiyên li pêşiya zimanê kurdî bir rojeva Meclîsê. Gunay bi boneya 88'emîn salvegera derxistina Kovara Hawarê ya 15'ê Gulana 1932'yan ji hêla Celadet Elî Bedirxan ve hatibû derxistin, pêşniyazpirsek da serokatiya meclisê. Gunay, di peşniyazpirsa xwe de têkildarî zimanê kurdî ji 7 wezîran 88 pirsan kir. Gunay, ji Wezîrê Perwerdehiyê Ziya Selçûk (26 pirs), Wezîrê Karên Navxweyî Suleyman Soylû (15 pirs), Wezîrê Tenduristiyê Fahrettin Koca (10 pirs), Wezîrê Çand û Turîzmê Mehmet Nurî Ersoy (17 pirs), Wezîrê Dadê Abdulhamît Gul (9 pirs), Wezîra Xizmetên Malbat, Xebat û Civakî Zehra Zumrut Selçûk (7 pirs) û ji Wezîrê Ragihandin û Binesaziyê Adil Îsmailoglû jî (4 pirs) kir.

# Dîsa şaredarî hatin desteserkirin

Navenda Nûçeyan

Desthilata AKP'ê, di pêvajoya vîrusa koronayê de li dijî şaredariyên HDP'ê operasyona duyemîn a desteserkirina vîna gelê kurd pêk anî. Di destpêka pêvajoya vîrusa koronayê de AKP'ê di 23'yê adarê de şaredariya Êlih, Farqîn, Licê, Erxenî, Gêl, Norşîn, Xalfelî û Gokçebagê desteser kiribûn û qeyûm tayînî şûna hevşaredarên wan kiribûn.

Di 15'ê Gulanê Roja Cejna Zimanê Kurdî de desthilata AKP'ê dîsa berê xwe da şaredariyên kurdan û di vê çarçoveyê de şaredariyên Sêrt, Îdir, Misirc, Xana Hawêl û Vartînîsê yên di destê HDP'ê de desteser kirin û bi fermana Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylû qeyûm tayînî şûna hevşaredarên wan kirin. Bi vê re ji 65 şaredariyan tenê 12 şaredarî di destê HDP'ê man ên din hemû hatin desteserkirin.

**Hevşaredar binçav kirin**

Di heman rojê de polîsan Hevşaredara Sêrtê Bêrîvan Helen Işik, Havşedarê Xana Hawêlê Ramazan Sarsilmaz, Hevşaredarê Misircê Baran Akgul, Hevşaredarê Îdirê Yaşar Akkûş û Hevşaredarê Vartînîsê Casim Bûdak binçav kirin. Polîsan, deriyê mala Hevşaredar Bêrîvan Helen Işik a li Êlihê şikand û derî ji ber xist.

Polîsan dema Hevşaredar Yaşar Akkûş ji avahiya Şaredariya Îdirê derxist, Aksû bi wan keniya û got ku bila kenê wî ji polîsan re bibe derd. Aksû, piştre jî bi rêya parêzerên xwe ev peyam şand: "Hêza me ya herî mezin gel û kenê me ye. Me serî netewand û em ê netewînin jî."




**Alên tirk daleqandin!**

Dema desteserkirinê, polîsan avahiyên şaredariyan dorpêç kirin û alên tirk bi avahiyên şaredariyan ve kirin û sirûda îstiklalê di aporlorên şaredariyan de bi gel dan guhdarkirin. Ev hewldanên polîsan bûn sedema bertekên mezin. Nûnerên partiyên siyasî jî di nav de gelek kesan bertek nîşanî ev hewldanên polîsan da.

Piştî tayînkirina qeyûman hem li bajar û navçeyên şaredariyên wan hatibûn desteserkirin hem jî li bajarên din ji hêla HDP'iyan ve gelek çalakî hatin lidarxistin. Li bajar û navçeyên şaredariyên wan hatibûn desteserkirin, polîsan bi ava şid û gaza îsotê mudaxeleyî çalakiyan kir û hin siyasetmedar binçav kirin.

**Tayînkirina qeyûman darbe ye**

Hevserokê HDP'ê Mîthat Sancar, bi daxuyaniyekê bertekeke tund nîşanî tayînkirina qeyûman a ser şareriyên partiya xwe da. Sancar, da zanîn ku tayînkirina qeyûman li dijî vîna gelê kurd darbe ye û ew bi tu awayî vê darbeyê qebûl nakin. Sancar, da zanîn ku wê bi rê û rêbazên demokratîk li dijî tayînkirina qeyûman derkevin û divê herkes zanibe ku wê HDP bi paş de gav neavêje.

Dîsa Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) û Xebata Tifaqê ya Kurdistanî jî bi daxuyaniyên nivîskî bertek nîşanî tayînkirina qeyûman a ser şaredariyên HDP'ê da. Her sê tevgeran jî destnîşan kir ku tişta AKP dike nenaskirina mafê hilbijartinê yê gelê kurd e û xwestin gelê kurd li vîna xwe xwedî derkeve.

**Bêrêziya li dengê gel**

Hemû rêxistinên HDP'ê yên navçe û bajaran jî bi daxuyanî û çalakiyan nerazîbûn nîşanî tayînkirina qeyûman dan. Di daxuyaniyên rêxistinên HDP'ê de hat destnîşankirin ku nîqaşên darbeyê yên di rojên dawîn de ji aliyê AKP'ê ve hatine kirin ji aliyê AKP'ê bixwe ve ketiye meriyetê û li dijî vîna gelê kurd darbeyeke siyasî pêk hatiye.

Di serî de CHP partiyên muxalefetê û derdorên demokrat jî li dijî tayînkirina qeyûman derketin û bertek nîşanî operasyona AKP'ê ya li dijî şaredariyên HDP'ê dan. Partiyên muxalefetê, diyarkirin ku hevşaredarên HDP'ê bi dengê gel hatine hilbijartin û tayînkirina qeyûman a ser şaredariyên HDP'ê li dijî vîna kesên wan hilbijartine bêrêzî ye.

### Li gorî PE'yê demokrasî di bin talûkeyê de ye

Raportorê Tirkiyeyê yê Parlamentoya Ewropayê (PE) Nacho Sanchez Amor jî li ser hesabê xwe yê twîterê têkildarî tayînkirina qeyûman a ser şaredariyên HDP'ê daxuyaniyek da û berek nîşanî tayînkirina qeyûman da. Nacho Sanchez Amor, bang li rayedarên AKP'ê kir ku dev ji polîtîkayên tayînkirina qeyûman berde û ev tişt got: "Qet nebe divê mafê diyarkirina şaredarekî demkî ji qonseyên herêmî re bê nasîn. Baweriya bi bingeha demokrasiyê di bin talûkeyê de ye."

## Xweşkanî

Felemez Ulug



### Erka herî rast xizmeta civakê ye

Vîrusa korona (Covid-19) li tevahiya cîhanê jiyana mirovan xistiye bin xeteriyek mezin. Her roja diçe ji ber vê vîrusê bi sedan kes jiyana xwe jidest didin. Her çiqas vîrus bi lez belav bibe û pêşî lê neyê girtin jî, di belavbûn û nexweşiya vîrusê de tedbîrên ji hêla rayedaran ve tên girtin li ser pêşîgirtina belavbûna vîrusê wek tê xwestin bandorek erênî pêk nayne. Di vir de mirov dikare bêje rayedarên dewletan wek tê xwestin bi baldarî tevnagerin. Sedema vê jî li hemû welatan rayedarên li ser îktîdarê ne beriya her tiştî xwe û rejîma xwe difikirin. Lewma jiyana mirovan dikeve asta dûyem.

Di van demên dawî de yek ji welatê herî zêde vîrus lê belav bûye jî Rûsya ye. Li gor agahiyên ji navenda Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê hatine parvekirin Rûsya ji ber zêdebûna nexweşiya di rêjeya duyem de ye. Lê li Rûsyayê tedbîrên vê nexweşiyê çawa tên girtin ango ji bo ev nexweşî hîn zêdetir belav nebe tedbîrên çawa tên girtin?

Beriya her tiştî em dikarin bêjin, tesbîrên li tevahiya welat tên girtin li gor asta belavbûna vîrusê pir qels û nebes in. Her çiqas îktîdara Pûtîn xwe ji ber vê rewşa heyî berpirisyar nebîne jî li tevahiya welat ji ber rewşa heyî rayedarên Kremlînê berpirsiyar tên girtin.

Ji bo pêşî li belavbûna vîrusê bê girtin li tevahiya welat qedexeyên derketina derve hatin ragihandin. Lê ji ber ev biryar wek dihat xwestin pêk nehat û dewlet jî sist nezî bûyerê bû niha li tevahiya Rûsyayê krîzeke tendûristiyê ya cidî tê jiyîn.

Li ruxmî her roja diçe hêjmara nexweşa zêde dibe jî hikumet bi biryarnameyekê ve destûr da ku gelek cihên kar dikarin ji nû ve dest bi xebatê bikin. Ev jî asta tedbîr û lewaziyê tên jiyîn bi awayekî eşkere radixe ber çavan.

Di vê pêvajoya karantînayê de asta baweriya bi Pûtin bi awayekî cidî lewaz bûye. Ev jî di Kremlînê de nerehetiyekê dide avakirin. Ji ber ku Pûtîn hemû karmend û karsazên welat li dora xwe hewandine û rejîma xwe bi saya wan xurt dike, niha jî Pûtîn nikare dev ji van kesan berde. Lewma ji bo ev karmend û karsaz bikaribin kar bikin ango di vê rewşa krîzê de hîn pirtir qezenc bikin li ruxmî rewşa xeter jî destûra karkirinê ji van kesan re hat dayîn. Yanî mirov dikare bê ji bo çend kes qezenç bikin jiyana civakê dixin bin xeteriyekê. Ev jî di nav civakê de dibe sedem ku aciziyeke mezin çêbibe.

Lewma li Rûsyayê krîza heyî ne di warê tenduristiyê tenê di warê siyasî û civakî de jî bi awayekî xurt tê jiyîn. Ger di demek nêz de Kremlîn ji vê krîza heyî re çareseriyekê nebîne wê rewş hîn xirabtir bibê.

Ji niha ve di Kremlînê de hin dengên cuda hêdî hêdî bilind dibin. Di vê rewşa wisa xeter de ya herî girîng tendûristiya civakê ye. Rejîmên berjewendiyên xwe li ser yên civakê bigrin ew rejîm bi her awayî mehkûmî wendakirinê ne.

Rewşa Tirkiyeyê jî ji ya Rûsyayê ne pir dûr e. Desthilata AKP û MHP'ê ji bo beriya her tiştî dest dirêjî alîkarê xwe dikin û beşeke civakê ji nedîtinê ve tê. Di heman demê de wezareta karê hundir alîkariyê nadin şaredariyê CHP û HDP'ê. Ev lîstikên qirêj ên li ser jiyana civakê ne.

Desthilatên hêza xwe ji civakê negirin û hêza xwe ji bo ewlekarî, tenduristî û pêşketina civakê bi kar neynin ne gengaz e ku bikaribin roleke erênî di nav civakê de bilîzin.

Ji ber vîrusê di her civakê de êşên pir mezin tên jiyîn. Lewma desthilatdariyên niha li ser erkê ne pêwîst e li gor rêgzên xizmeta civakê kar bikin û xwe bi her awayî xwe ji parastina civakê berpirsiyar bibînin. Ev erk xizmeta herî rast e.

# DIVÊ HEMÛ KES DESTÊ XWE BIXE BIN BAR

# Ziman meseleyeke giran e

→ Zekî Gurur

Li ser ziman û çanda kurdî bernameyeke tund a tunekirinê tê meşandin. Axivêrên kurdî her roj kêmtir dibin, bi taybetî rêjeyeke zêde ya malbatên kurd zarokên xwe hînî zimanê kurdî nakin. Lewma jî pêdivî bi xebateke domdar û kedeke zêde heye. Bi rastî jî meseleya parastina ziman barekî giran e, divê her takekesê/a kurd di vî warî de destê xwe bixe bin bar

## Samî Tan kî ye?



Nivîskar û zimannasê kurd Samî Tan li bajarê Semsûrê ji dayik bûye. Di rojnameyên Welat, Welatê Me, Ozgur Ulke Azadiya Welat, DÎHAyê de xebitiye û gerînendetî û nivîskariya rojnameyê kiriye. Bi salan di Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de têkildarî ziman gelek xebat kiriye, wekî serok û hevserok kar kiriye. Pirtûkên rêziman û perwerdehiyê amade kiriye. Tan niha Hevserokê PENa Kurd e û di nav xebatên Tora Ziman û Çanda Kurdî de cih digire.

*Kurd bi salan e ji bo zimanê xwe têdikoşin û li dijî her cure zext û zordariyan zimanê xwe gihandin van rojan. Nivîskar û zimannasê kurd Samî Tan têkildarî rewşa ziman û xebatên Tora Ziman û Çanda Kurdî pirsên rojnameya me bersivand.*

***Tora Ziman û Çanda Kurdî piştî komxebat û komcivîneke avakirina xwe îlan kir û dest bi kar û xebatên xwe kir. Dikarî ji destpêkê heta niha panorameyeke giştî der barê serencama Torê de raxî ber çavan? (Maseyên tematîk, sekreterya, desteya şêwrê, rêbazname)***

Her wekî tê zanîn Tora Ziman û Çanda Kurdî li ser banga 45 kesan pêşî bi komxebatekê, piştra jî di destpêka sala 2020'an da bi komcivînekê ava bû. Di komcivînê da nêzî 300 kesî beşdarî kir, 12 maseyên tematîk ava bûn, maseyan raporên xwe pêşkêş kirin. Di dawîya komcivînê da 27 kes wekî endamên meclisa Tora Ziman û Çanda Kurdî hatin hilbijartin. Meclisa Torê jî di civîna xwe ya pêşî da 5 kes wekî sekreterya peywirdar kirin. Di heman civînê da ji bo nivîsandina rêbaznameyê komîsyonek hate peywirdarkirin û wê komîsyonê jî rêbazname nivîsand.

Her wiha ji bo amadekirina raporên xebatê û derxistina bernameya xebatê kesên pispor peywir wergirt, ew li ser raporên maseyan ên komcivîna mezin dixebitin da ku bernameya xebatê ya Tora Ziman û Çanda Kurdî derxin. Amadekarî ji bo civîneke nû ya berfireh dihate kirin, lê pêvajoya koronayê dest pê kir, lewra jî ew xebat rawestiyan. Niha xebat li ser medyaya civakî têne meşandin.

***Kurdî di dîrokê de û nemaze ji serê sedsalê heta niha her rastî zext û fişarên sîstematîk ên bişaftinê hat. Lê em dibînin ku di 4-5 salên dawî de ev zext û êriş li dor bernameyekê tê meşandin û ev yek avakirina stratejiyeke zimanî li ser kurdan ferz dike. Di rewşeke wiha de gelo Tor dikare pêşengiya avakirina stratejî û plansaziyeke giştî ya zimanî ji bo kurdî bike?***

Meseleya ziman meseleyeke giran e, xebateke berfireh û girseyî dixwaze. Tora Ziman û Çanda Kurdî di têkoşîna parastin û geşkirina zimanê kurdî de gaveka biçûk avêt. Hewl dide ku hişmendîya dilsoz û dilsojîya çand û zimanê kurdî li nava civaka kurd belav bike, di warê parastin û geşkirina zimanê kurdî da hemû beşên civakê vexdiwîne qada xebatê. Li alîyekî kend û kospên ku desthilatdar derdixin pêşberî kurdîperweran, li alîyê din jî wekî encama polîtîkayên wan ên bi dehan salan, dûrketina me ya ji çand û ziman heye. Ev hişmendîya çand û zimanê xwe bêkêr dibîne, jê direve, zarokên xwe bi vî zimanî û bi vê çandê perwerde nake jî encameke pest û pêkutîyên dagirkeran e û li ber geşbûna xebatê asteng e.

Divê em ji bîr nekin ku tiştê çarenûsa çand û zimanê me diyar bike, têkoşîn û xebata gelê kurd bi xwe ye. Heke kurd biryara vê yekê bidin ku digel hemû êş û azaran,



zilm û zordarîyê, divê ew wekî kurd bijîn, hingî ew dikarin vî zimanî û vê çandê biparêzin, geş jî bikin. Hewldana me jî ji bo vê yekê ye ku em xweşikî û dewlemendîya çanda xwe, zimanê xwe nîşanî her kesî bidin.

Tora Ziman û Çanda Kurdî piranîya kedkar û dildarên ziman û çanda kurdî digire nava xwe, her wiha dikare li ser bingeha parastin û geşkirina çand û zimanê kurdî bi hemû kes û derdoran ra hevkarîyê bike, dîsa dikare ji bo parastin û geşkirina çand û zimanên din bi gelên din ra jî platformên hevpar ava bike.

Wekî qadeke sivîl a xebatê, têkoşîna ji bo ziman û çanda kurdî hê nû ye. Têkoşîna ji bo ziman di destpêka salên 2000'î de bi çalakîya xwendekarên zanîngehan dest pê kir, ji hingê ve xebat di vê qadê da têne kirin, belê tecrûbe kêm e, lê dîsa jî potansîyeleke xurt heye, daxwaza parastin û geşkirina ziman û çandê her roj geştir dibe. Bi taybetî ciwanên kurd di vî warî de hêvîyeke baş didin mirov. Lewma jî em bawer in dê ev têkoşîn geş bibe û encamên baş bi dest bixe.

***Di pêvajoya korona û karantînayê de Tora Çand û Ziman çi xebat kirin gelo? Di pêvajoyeke wiha de bi rêya onlineyê bişaftin bênavber dewam kir û li hemberî vê yekê xebatên torê çi bûn. Her wiha jiyaneke dîjîtal û online bêtir li ber me ye û ji bo vê qadê xebat û projeyên we hene gelo?***

Li hemberî pişaftina online, sazîyên me jî dest bi perwerdehîya online a kurdî kir, ev xebat jî dê geş bibe. Pêşî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, piştre Med-Der û Weqfa Mezopotamyayê xebatên xwe yên ji bo hînkirina ziman û rêzimana kurdî li ser platformên medyaya civakî bi awayekî online pêk anîn. Her wiha gelek ciwanên kurd jî xebatên fêrkirina kurdî bi awayekî online bi rê ve dibin, ew jî cihê kêfxweşîyê ye. Tora Ziman û Çanda Kurdî dikare pêşengîya vê yekê bike ku ev xebat hê sîstematîk û hê bi pisporî pêk werin.

***Tora Ziman û Çanda Kurdî bernameyeke têr û tije derbarê 15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de derxist û gelek mijarên girîng bi pispor û zanayan da û dide gengeşekirin. Ji bo ku kurdî tenê di rojên sembolîk de nekeve rojevê û bibe tiştekî asayî û jiyanî, gelo çi dikare bê kirin û Tor dikare serpereştiya çi bike?***

Her wekî me li jorê da xuyakirin, Tora Ziman û Çanda Kurdî dikare platformên medyaya civakî bi awayekî çalak bi kar bîne. Ne tenê di rojên taybet da her roj bi boneyên cur bi cur, bo nimûne dema êrîşek li ser kurdî çêbû, yan jî pêşketinek di warê çand û zimanê kurdî pêk hat dikare nûçe û agahîyan li ser tora medyaya civakî belav bike. Her wiha bi awayekî bi rêkûpêk dikare raporan der barê çand û zimanê kurdî da belav bike. Ji bo avakirina pergaleke perwerdehîyê ya online dikare xebatê bide destpêkirin. Helbet dem hatiye ku televîzyonên kurdî beşek ji weşana xwe perwerdehîya bi kurdî terxan bike. Belkî televîzyon bi tenê di vî warî da weşanê bike, dê baştir bibe.

***Di demên dawîn de têkildarî axaftin, xwendin û nivîsandina kurdî hin anket tên çêkirin. Li gorî van anket û lêkolînan daneyên balkêş derdikevin holê. Tu ji bo van anketan çi difikirî û ev ji bo dahatûya kurdî çi dibêje ji me re?***

Ev anket tiştekî nîşan didin; di gel hemû pest û pêkutîyan, gelê kurd dev ji ziman û çanda xwe bernade. Rêjeyeka zêde (nêzî ji sedî 90) dixwazin zarokên wan bi kurdî jî werin perwerdekirin. Belê daxwaza parastina kurdî heye, lê belê tenê daxwaz têrê nake, polîtîka û bernameyeke zelal, xebateke birêkûpêk pêwîst e. Ji ber ku li ser ziman û çanda kurdî bernameyeke tund a tunekirinê tê meşandin. Axivêrên kurdî her roj kêmtir dibin, bi taybetî rêjeyeka zêde ya malbatên kurd zarokên xwe hînî zimanê kurdî nakin. Lewma jî pêdivî bi xebateke domdar û kedeke zêde heye. Bi rastî jî meseleya parastina ziman barekî giran e, divê her takekesê/a kurd di vî warî de destê xwe bixe bin bar.

***Dîrok wek goristeneke zimanan e, gelek zimanan li ber bayê zemên xwe negirtine û winda bûne. Ji bo kurdî jî endîşeyeke wiha heye û ev yek zêdetir refleksên muhafazakar/conservative bi xwe re tîne. Gelo divê kurd bitirsin ji ber ihtimala nemana kurdî yan na?***

Bi awayekî giştî metirsîya tunebûna kurdî nîn e. Li Başûr jiyan bi kurdî ye, li Rojava kurdî her ku diçe geştir dibe. Li Rojhilat tevî hemû pest û pêkutîyan jî wekî zimanê axafinê kurdî di nava civakê da serdest e. Lê belê bi taybetî ji bo bakurê Kurdistanê ev metirsî heye; jixwe li gelek herêman kurdî wekî zimanekî toreyî, wekî zimanê kal û pîran, wekî zimanê demên berê maye. Li gelek bajaran zimanekî dureh derketiye holê; gelek kes her du zimanan (tirkî û kurdî) li gel hev bi kar tînin, ev zimanê dureh jî hêdî hêdî cihê xwe ji tirkî ra dihêle.

Ji alîyekî ve kurdî girêdayî çarenûsa kurdan bi xwe ye, ji alîyekî ve girêdayî helwesta wan a li hemberî ziman, çand û nasnameya kurdî ye. Gelo ew dixwazin wekî kurd bijîn an bibin tiştekî? Heke dixwazin wekî kurd bijîn divê helwesta xwe ya li hemberî ziman û çanda xwe biguhêrin, ji bo parastin û geşkirina zimanê xwe hewl bidin. Helbet mercên siyasî jî dê biguherin, guherîna wan mercan dê bi xwe ra pêşketinên mezintir bîne.





# Nameyeke derengmayî ji bo Kurdîyê



Mîrza Metîn*

Zimanê min, çiyayê min, diya kurê xwe, min nebibexşîne!

Ez im, ev ê ku ji te sirgûnkirî û bi zimanê biyanîyan perwerdekirî.

Ez im, ev ê ku jiber pişaftin û xwepişaftinê şerm dike û şerma xwe vedişêre li ber neynika te. Ez im; bêbîn im; bêwelat û bê te bêaqil im.

Û ez bi mîlyonan im. Min nebexşîne!

Ez im, ev ê ku gava biyanîyekê/î tê civatê, dev ji te berdide û yekser dest bi elifbaya bîyanîyan dike. Bîyanîyê te me!

Ez im, ev ê ku bi te xwenebawer e, bi hînbûn û bi zanîna zimanê bîyanîyan xwebawer e. Bawerî tu yî!

Ez im, ev ê ku ji te bêhtir, kêfê digire bi axaftina zimanê bîyanîyan. Kêf tu yî!

Ez im, ev ê ku bi zimanê bîyanîyan diqîre û mafên xwe dîsa bi zimanê bîyanîyan dixwaze biparêze. Deng tu yî, qîr di te de ye!

Ez im dîsa, ev ê ku di nav bîyanîyan de bûye hunermendekî navdar lê bi serê neynûkekê jî qîmetê nade te. Navdar tu yî, qîmet di te de ye!

Ez im, ev ê ku têra xwe bi elifbaya te napeyive, naxwîne û nanivîsîne. "Na" ez im, "erê" tu yî!

Ez im, ev ê ku ji te zêdetir; ji partîyan re, ji îdeolojîyan re, ji sînoran re, ji alan re, ji olan re, ji serokan re, ji rêxistinan re, ji panotan re û ji xwe re qîmetê dide. Bêguman, bêyî te qet yek jî nabe!

Ez im, ev ê ku deng û zarê te hînî zarokên xwe nake û kêmzarokan mezin dike.

Dîsa ez im, ev ê ku te fam dike, lê nikare bi te bipeyîve.

Ev jî ez im, ev ê ku qet nikare te fam bike, tevî ku ji qewmê te ye.

Ev jî ez im, ev ê ku te ji bîr kiriye.

Ez im, ev ê ku dixwaze hînî te bibe, lê bi salan e nikare gavekê jî bavêje.

Ez im, ev ê ku ji karkerên te yên xwedî fikren cuda re dîsa bi rîya te dibêje xayîn.

Dîsa ez im, ev ê ku te bin pê dike û dibêje ti ne tu zimanî, ti ne zimanê min î.

Heta ev jî ez im, ev ê ku bi saya te bûye rewşenbîr û nivîskar û hunermend û sîyasetmedar, lê bi ser de, dîsa zimanê bîyanîyan ji xwe re dike qur'an.

Ez im, ev ê ku bi salan e ji bo te tekoşîna sîyasî dimeşîne û xwe diêşîne û dişewitîne, lê belê peyvek jî ji te nagire û nake derman ji êş û birînên xwe re.

Ez im dîsa, ev ê ku ji bo xwendina lorîkekê destûrê dixwaze ji serdestan.

Belê ez im, ev ê ku nikare bi te tîcaretê bike.

Belê ez im, ev ê ku nikare bi te perwerdehî bike.

Dîsa ez im, ev ê ku hewl dide ku tenê bi zimanê bîyanîyan xwe û hebûna xwe û xwebûna xwe fam bike. Bes fam di te de ye.

Ez im, ev ê ku tenê bi zimanê bîyanîyan dîroka te dixwîne. Bes dîrok di te de ye.

Ez im, ev ê ku şabûn û hezkirinên xwe bi te bilêv nake. Bes şabûn di te de ye.

Ez im, ev ê ku hêrs û azarên xwe bi te nîşan nade. Bes hêrs û azar di te de…

Ez im, ev ê ku nikare te bike zimaneke hevçax û gerdûnî. Bes tu hevçax î, gerdûn tu yî. Ez im, ev ê ku bi gotin û peyvên te li ber xwe nade.

Û ez im, ev ê ku (tu lê zêde bike)………………………… ……………..……..

Zimanê min, piştî û hêza min, maka cûcikên xwe, min nebexşîne!

Daristana dara xwe; aqilê min, welatê min, min nebibexşîne!

Divê ez bi rêzdarî kelpîçekî daynim ser kirin û gotinên wan, ên ku canê xwe bona te kirine şûr û mertal li hemberî zordestan û bi qewlê berxwedêrên berê bibêjim "berxwedan jîyan e" û lê zêde bikim bibêjim: berxwedan tu yî. Û erê, divê ez fam bikim ku şûr jî tu yî mertal jî… Çi çare, li dinyayê bi qasî kelpîçekî jî mal û milk û warê min tune ye; ji xeynî deng û rengên te ku ji kelpîçan saxlemtir in. Helbet mal û milk û war tu yî…

Bi hezaran peyv û deng û rengên te hene û her yek jî dibiriqin wek stêrkên te. Roj tu yî.

Ez bi xwe piştî 14 salîya xwe hay ji te bûm û hatim ber baxçeya te,

Di 21 salîya xwe de bi zimanekê şikestî bi rê ketim ber bi cîhana te,

Hatim 40 salîya xwe lê hîn nehatim ber serê deryaya te.

Ruhê min, deryaya masîya xwe, min nebexşîne!

Dîsa jî bextewarim, ku îro qels be jî, dikarim bi te bixwînim, binivîsim û bipeyîvim.

Na, qurbana şa'irên te yên xewnazad, dîsa jî min nebexşîne, min pir xeletî kiriye li hemberî te!

Jiber ku xewn û xeyal û hizrên min bi temamî hîn ne bi Kurdî ne.

Heta ku ez dengê te yê şêrîn nekim welatê xwe,

Heta ku xewn û xeyal û hizrên min bi temamî nebe Kurdî li welatê te, min nebexşîne! Zimanê min, bîr û hafizeya min, hebûn û xwebûna min, asîmana teyrê xwe;

Heyho, ez ne yek im ne dudo, ne sed im ne hezar,

Bi mîlyonan im û bê te bûme bê ruh û bêzar.

Ku ez bi xwe nikaribim, bi zordestîyê re jî nikarim.

Ho zemano! Ho rastîyo!

Ziman berxwedan e, "berxwedan jîyan e"!

Roja Zimanê Kurdî li me pîroz be!

**Ev name di 20ê Rêbendanê 2020an de li Kolnê hatîye nivîsandin.**

***Şanonûs**



Mertal

SelîmTemo

## Wate: Îro û Do

Faustê Johann Wolfgang von Goetheyî li ber gotina Tewradê, "pêşî kelam hebû", radibe û dibêje, "divê bê gotin ku berê wate hebû." Ez jî dibêjim, "berê ziman hebû da wate di nav da bê honandin." Belkî helbest ji wir heşîn dibe. Lê di vê behsê da dîrokî û dîrokîparêzî wek hişkgirêkekê dixuyin. Jiyîna me ya di roja îro da destûr û hêza lêkolîn û şirovekirina roja çûyî dide me, lê yên di roja duhî da jiyane nikaribûn me şirove bikin. Em wan dinasin, lê em ji bo wan nenas in. Ligel vê yeke, bo me tiştekî gotine?

Gotina tiştekî bo roja çûyî, roja îro û roja tê, lêgerîna nemiriyê ye. Jixwe Gilgamêş nav û naveroka çîroka me diyar kiriye: Binpêkirina sînoran û gotinek bo demê. Tişta digot helbest bû ku Benno Landsberger dibêje bi "behra recez" hatiye nivîsîn.

Helbesta zimên heye, her ziman rîtmek û olaneka xwe heye. Her ziman xwediyê qadek ji qada wateyan e û ne bi peyv û hevokan an jî bi taybetmendiyên xwe yên gramatîk, lê bi vê qadê dibe zimanekî cuda ji yên dî. Heke wisa be, em ê çawa têbigihên? Heke her ziman xwediyê qadeka wateyî be, pêkan e em bi hînbûn an jî bi wergeriyê wan dengan bibihîsin? Gelo deriyê zimanan heya taqê piştê vekirîne?

David Damrosch dibêje, kesên bi zên û bîreweriya îroyîn li metnên berê dinêrin, dibêjin qey xwediyên van metnan xwestine romanekê binivîsin lê pêk neanîne. Heke şêwe, cure û zimên ber bi roja me ve kemilîbin, em wek "lehengên dema xwe" çiqas bextewêr in! Heke ji ber jiyîna di roja îro da, ku xelasî jê tune, em girêdayî roja xwe bin, pêkan e em dengê rojên berê bibihîsin? Ji ber ku guh û mejiyê me bi gotinên ayîdê roja îro mişt û sermişt in.

Lê çima helbestên Gilgamêşî û yên îroyîn dişibin hev? Ev şibandin ji ber vegotina heman tiştan e yan ji ber çavê me yên roja îroyîn e ku her tişta dibîne werdigerîne ser zên û zimanê roja xwe? Di ser da gellek wergerî hene: **1)** Metna berê hatiye nivîsîn, bi zimanê berê hatiye nivîsîn. Heke zimanê te berdewamiya wî zimanî be, divê tu ji zimanê berê wergerînî zimanê îroyîn. **2)** Heke bi zimanekî dî be, divê ji wî zimanê berê bê wergerandin bo îroyîna wî zimanî. **3)** Ji wî zimanê îroyîn tê wergerandin bo zimanê te yê îroyîn. **4)** Wergêr dikare metneke kevn ji zimanekî dî yê çend car hatiye nûkirin û carikirin bi reng û kincên roja îroyîn wergerîne? **5)** Wergêr ji bo bîhna zemanê berê jê bê bi qeydê zimanê te yî berê werdigerîne? **6)** Heke wate di nav zimên da be û em bi wî rengî bi dest dixin, çima helbest halê "prosaic" an jî saziya wateya sazkirî xera dike?


Di asasê xwe da em helbestê li ser zemînekê û di nav wusat/warekê da werdigirin. Wergirtina me ya îroyîn û ya duhî ji hev cuda ne. Em îro dikarin hemû rabirdûyê bibînin û bêjin: Helbesta duhî, dubarekirina helbesta beriya xwe, ango "helbesta eslî" ye. Yanê helbestek hatiye nivîsîn, ew helbest "îdea" ye û helbeskarên demê ew dubare kirine.

Gava em bidin dû şopa helbesteka kevn, şop wê me bibe eslê wê helbestê. Ji ber ku ew siya metna eslî ye. Helbesta klasîk berhema Nû-Platonîzmê ye. Gava em vê diyardeyê bi hunera Serdema Navîn a alema Îslamê re rûbibû bikin, em ê bibînin ku ev huner li ser bersivdayîn û dubarekirinê ava bûye. Xalî, mehfûr, ferfûr, kitabe, nexşe, kutek û lengerên avahiyan, minare, qube, derî, eywan, derence, şibak, zemîn ûyd. li hevdu dinêrin, simetrîk in. Wek mînak, îro taqekê Medreseya Sor li Cizîra Botan hilweşiyaye. Ku bixwazî, dikarî li gor parçe-avahiya li pêşber ava bikî, çimkî simetrîk e û olana taqê dî ye. Heke helbest jî perçeyek ji heman hunerê be, ew jî olana helbesteka li pêşberî xwe ye. Naxwe yek şiroveya helbesteka berê pêkan e: Ew bersiva helbesteka beriya xwe ye. Êdî em ne behsa şiroveyê, lê behsa arkeolojiyê dikin.

Beriya Walter Benjamin jî "pirkirin" (reproduction) hebû. Lê di dema borî da teknolojî her yekaneya hunerî wek hevdu pir nedikir. Kesên kopî dikirin, yanê "mistensîx", metnê ji nû ve diafirandin. Îca em ê behsa du pirkirinan bikin: **1)** Helbestkar helbesteka beriya xwe dubare-pir dike. **2)** Mistensîx, dubare-pirkirina helbeskêr pir dike. Mistensîx: Ew ê/a kopiya kopiya eslî kopî dike û ji nû ve diafirîne!

Helbesta kevn di nav sînoran da dihat nivîsandin. Di ser da sînorên kaxizî jî hebûn. Kaxiz bînin ber çavê xwe. Divê ji çar alî ve valahî hebin bo nezîre, îtiraz û notan. Carina valahî ji şûna metnê berfrehtir in. Te diye metn çawa gazî xwîner dike, dibêje were tu jî binivîse; çi nezîre, çi îtiraz. Yanê xwîner dibe mitercim û mielifê metne û xwendin dibe nivîsandin û aferînêrî!

Heke aferînêrî tenê taybetmendiya Xwedê be, wê çima helbestkar aferînêr be? Divê ew dubarekêr be! Ji ber vê ye ku wergêr û xwîner nêziktir in bo dema me; herçî nivîskar e, ew anonim e! Yanê roja çûyî bi çavê roja îroyîn nayê dîtin. Ji ber ku hunera Serdema Navîn di nav sînoran da bû; kêm, netemam û dûrî xwe. Li gor baweriya wê demê, Xwedê heye, ew temam û xwe ye. Ebd biqisûr û kêm e, gava bimire digîje eslê xwe û temam dibe. Ji ber vê yekê Nicolas Boileau, di L'Art Poetique (Hunera Helbestê) da dibêje, "heke îlhama Xwedê tunebe helbest nayê nivîsandin." Îca li wir takekes û kirde/biwar tunebû; çi bo wergerê, çi bo nivîsînê, çi bo xwendinê. Lê heke wekî roja îroyîn di roja çûyî da jî wate hebe, divê di nav zimên da hatibe honandin ku karibe tiştekî bo zemên bibêje.



# Korona, tenêtî û vegera li xwe!

Em ji bîr nekin, reva ji tenêtiyê ji nexweşiyên pandemîk sosretir e! Ji lewre divê em carna li xwe vegerin. Ev veger dê nexweşiyan ji me dûr bixe

Ardîn Dîren

Dinya careke din bi pandemiyeke sosret re rû bi rû ye. Ev ne ya ewil û ew ê ne ya dawî be jî. Mirovahî berê jî bi nexweşiyên wiha re kete nav qayişkêşanê û ji ber nexweşiyên bi vî rengî gelek kesan jiyana xwe ji dest da. Vaye dîsa hêlan e û ev çend meh in pandemiyek bi navê koronayê li ber deriyê me mexel hatiye û nahêle em ji malê derkevin. Em tev hêsîrê wê ne, hema bêje hemû dinya matmayî li bandora vê pandemiyê temaşe dike. Dilop bi dilop, peşk bi peşk belav dibe. Roj bi roj çeper firehtir dibe.

**Di van wextan de me çikir, em çi dikin û em ê çibikin gelo?**

Yên ji tenêtiyê aciz bûn, yên li ber xwe didin; yên di malê de xwe xwarin; yên tu fikarek wan tune ji vê rewşê; yên ji hezkiriyên xwe dûr man; yên mecbûr man bixebitin; yên di rewşên wiha de jî nikaribûn bibin xwedî tevdîr û betlaneyekê! Hema wisa bi carekê dinya cemidî. Her kes di ciyê xwe de neçar ma wek di dafikekê de bipirpite. Lê ya girîng ew e ku mirov çawa ji van dafikan bifilite û bêyî xwe zêde xwîn bike li riyên xelasiyê bigere. Di van rojan de dilê me çiqas zîz bû û em çiqas li ser vê rewşê ponijîn.

**Gelo me berê xwe da çi? Em bi çi re mijûl bûn? Em serê xwe bi çi diêşînin?**

Gotina, "Ew ê êdî tu tişt nebe wek berê!" di kerikên guhên min de olan dide. Çi gotineke qerase. Mirov ditirse. Ji dil jî wê nebe wek berê gelo? Jixwe "berê" jî ewqas ne baş bû. Evcar dê xerabtir bibe. Gelo dê mirov li hev û li dinyayê werin rehmê an na? Elbet di destê me de ye ev yek, ez jî di wê baweriyê de me. Lê destê me ne li ser dilê me ye mixabin. Hêvîdar im bi saya vê belatê destê me here ser dilê me, pozê me ji hin tiştan bişewite û her yek ji me karibe bibe xwedî bîr û bîranînek. Û ev bîr û bîranînên me ji yên "berê" çêtir bin.

Di vê pêvajoyê de her kes bîra xwe kola û hinek li xwe û li zaroktiya xwe vegeriyan. Di van mehan de tişta herî dilê min geş kir û ez pê kêfxweş bûm ev veger e. Gelek kesan bi riya wêneyan ev yek kir. Ji arşîvên xwe yên bi toz derxistin bîranînên salan. Dîsa hin kes li serboriyên xwe li hevaltiyên berê vegeriyan. Hin kes li çîrokên xwe yên nîvco, hin kes li helbestên xwe, hin kes li pirtûkên xwe, hin kes li zarokên xwe, hin kes li bira û pismamên xwe, hin kes li dilketiyên xwe yên berê. Hin kes li heywanên xwe. Hin kes li xwezayê vegeriyan. Bêguman mirov dikare dirêj bike. Lê tişta dixwazim bibêjim her mirov kêm zêde di van demên zor de ber bi rabirdûya xwe rêwîtiyekê kir. Vegerek çêbû. Ev yek hêza tenêtiyê ye ku mirov bi xwe re rû bi rû dihêle û li xwe vedigerîne. Kî çiqas tişt zeft kir ango çiqas tişt dît û bi bîr anî ez nizanim lê li gor çavdêriyên min her kes li gor xwe rêwîtiyek kir. Ev yek tiştekî baş e û divê tenê ne di rojên wiha de her wiha divê di jiyana me de tim hebin rêwîtiyên wisa. Ji ber ku "Her kes dikare pêşeroja xwe bibîne lê kes naxwaze paşeroja xwe bi bîr bîne!" Ev hinek zehmet e ji lewre xirecira vî zemanî û lez û beza mirovên vî zemanî nahêle ku mirov bêhnekê bistîne û rêwîtiyan bike. Tenê hatiye hînkirin ku divê em tim di nav vê bezê de bin û wek pêşbirkekê binirxînin vî zemanî. Lê rastî ne wiha ye. Mirov divê karibe hin caran bêhna xwe bistîne û wek ku em di van zemanên xerab de dikin dîsa di demên pêş de jî karibe here paşeroja xwe û hin tiştan bi bîr bîne.

Zimanê bîranînan ew ê dilekî zîz çêke bi vî zemanê dijwar re! Dixwazim bi vê hêviyê bawer bim.

Dilê vî zemanî hişk e. Aramî pir kêm e. Mixabin ev zemanê nûjen ku em hemû tê re derbas dibin, nahêlin em bi serê xwe bimînin û gava em bi serê xwe dimînin bi carekê aciziyek li ber dilê me çêdibe û sebir û tebat bi me nakeve. Gelek caran em nizanin em çi xwelî li serê xwe bikin û xwe çawa aş bikin! Lê divê mirov karibe bi serê xwe bimîne û hînî tenêtiyê bibe. Yanî bi gotina Tarkovskî, mirov ne mecbûr xwe tenê bihêle lê gava tenê ma jî divê mirov aciz nebe. Ev yek ji bo mirov xwe nas bike û birame pêwîst e. Lê ji ber ku em hînî vê yekê nebûne û ev zemanê dijwar vê derfetê nedaye me, em xwe nebaş hîs dikin û di nav valahiyên tewş de wextê xwe pûç dikin. Ev jî tê vê maneyê ku em xwe têr nas nakin, têra xwe bi tenê nemane û ponijîneke me li ser hebûna me çênebûye. Divê em jî bîr nekin ku tenêtî û mayîna bi serê xwe di ser zeman de ye, em bi vî awayî dikarin ew dilê hişk hinek nerm bikin û aramtir bibin.

Li gel ku bihevrebûn tiştek hêja ye û ji bo civakê hewce ye, bi heman rengî tenêtî jî bi her awayî pêwîst e û divê em ji vê yekê jî nerevin. Dîsa heger em guh bidin Tarkovskî, "Ez wisa têdigihîjim, gava mirov bi serê xwe dimînin û aciz dibin talûkeyek dest pê dike. Ev talûke ew e ku mirov nirxê nadin xwe." Ji lewma divê em ji tenêtiya xwe aciz nebin û karibin pêre bijîn. Divê em xwe û wextê xwe bi nirx bibînin û mijûlahiyekê ji xwe re çêkin. Nexwe, tenê ne ji tenêtiya xwe her wiha em ê ji xwe, ji canê xwe û ji hebûna xwe jî aciz bibin. Aha wê gavê ew ê talûkeyek mezintir dest pê bike. Divê em xwe nexin nav vê talûkeya mezin. Berovajî vê divê em bibin talûkeyê talûkeyan!

Bi kurt û kurmancî divê em beriya nexweşiyan an jî piştî nexeweşiyan bi her awayî xwe ji talûkeyan dûr bigirin. Divê em di dafikan de neçar nemînin û hin riyan peyda bikin ji bo xwe. Em ji bîr nekin, reva ji tenêtiyê ji nexweşiyên pandemîk sosretir e! Ji lewre divê em carna li xwe vegerin. Ev veger dê nexweşiyan ji me dûr bixe. Heger em li dora bîranînên xwe bicivin em ê ji hemû neqeban derbas bibin.





*Mem Avba*

## Çareserî referandûm an rêkeftin e?

Li Iraqê piştî hilweşîna rejîma Seddam Huseyîn, di sala 2005'an de destûrkeke nû hat çêkirin. Di vê destûra bi referandumeke giştî hatî misogerkirin de qaşo hate diyarkirin ku mafê hemû pêkhateyên Iraqê ketiye bin ewlehiyê. Lê belê ji ber ku ev destûr li ser realîteya civakên Iraqê nehatibû amadekirin, di pratîkê de hikumeteke li gorî vê destûrê pêk nehat!

Mekanîzmaya ji bo çareserkirina pirsgirêkên Iraqê hatî destnîşankirin jî neket meriyetê. Nexasim jî kêşe û nakokiyên di navbera herêma Kurdistan û Iraqê de, mijara 'xala 140'emîn' çareser nebûn.

Ji hikumeta Eyad Ellewî (1 hezîran 2004-3 gulan 2005), heta Îbrahîm Cehferî (3 gulan 2005-20 gulan 2006) heta Nûrî Malîkî, Heyder Ebadî, Adil Ebdulmehdî, niha jî Mustefa Kazimî hikumetên pêk hatî, li ser esasên destûr û rêgezên hatî diyar kirin ava nebûne; li ser esasê dabeşkirina desthilat û pere ku di navbera Bexda û Hewlêrê de bê parvekirin…

Lewre hikumetên heta niha hatî avakirin ji bo ku ne xwedî siyaseteke serbixwe ne, ji xizmeta gel wêdetir li gorî berjewendiyên çînên desthilatdar tevgeriyane, lewma arîşeyên civakî (kêşeyên bêkarî, gendelî, îdarî, siyasî, xizmetguzarî; jin, ciwanan, ekolojî hwd) kûrtir û mezintir bûne.

Çîna niha li ser destihlata Bexdayê, heta niha hewl daye xwe bihêztir bike û vê hêza xwe jî li hemberî hikumeta Hewlêrê bi kar bîne. Dewletên dagirker ên Kurdistanê jî hemfikir in ku li hemberî bihêzbûna hikumeta Bexdayê, hikumeta Hewlêrê lawaz bibe û têk biçe. Lewre çi ji destê wan hatiye alîkariya eşkere û nepen dane hikumeta Bexdayê.

Li aliyê din beşa desthilatdar a herêma Kurdistanê jî, her tim bi şik û guman li hikumetên Bexdayê nihêriye. Ev jî bûye sedem ku her du alî jî rast nêzî hev nebin. Bi gotineke dîtir, heta niha hikumeta navendî bawerî pê neaniye ku li Kurdistanê hikumeteke federal heye; hikumeta herêmê jî ji hukumeta navendî piştras nebûye ku di mijarên hikumeteke hevbeş a rasteqîn de xwedî pare ku weke du hêzên hevbeş dewleta Iraqê bi rê ve bibin…

Mînak sala 2014'an, gava nakokiya di navbera hikumeta herêma Kurdistanê û hikumeta Malîkî de çêbû û DAIŞ'ê Mûsil dagir kir; Barzanî weke serokê herêmê roja piştî dagirkirina Mûsulê li Parlemena Herêma Kurdistanê ragihand û got '…niha dewleteke dîtir cîranê me ye, pêwîst e hikumeta navendî jî li gorî wê tevbigere!'

Dîsa dema di navbera hikumeta Ebadî û hikumeta herêmê de li ser vekişandina pêşmerge ya sînorên beriya êrîşên DAIŞ'ê, hikumeta herêmê jî 25'ê Îlona 2017'an ragihand ku dê refaranduma serxwebûna Kurdistanê pêk bîne. Lê belê ji bo ku rêveberiya başûrê Kurdistanê bi vê birayarê rojeva siyasî ya cîhanê baş nexwend; ne hêzên herêmî, ne jî yên navneteweyî piştgirî nedan vê referandumê, lewre 16'ê Cotmeha 2017'an hikumeta Bexdayê êrîş bir ser herêma Kurdistanê û gelek destkeftî ji destê kurdan çûn!

Niha jî di vê rewşa hem li hundir, hem jî li derve qeyraneke kûr tê jiyîn de li şûna hikumeta navendî nermî nîşanî herêma Kurdistanê bide; berevajî dixwaze qeyranên li dijî herêma Kurdistanê pêk werin. Di hikumeta nû ya Mustefa Kazimî de ku divê sê wezaretan bide herêma Kurdistanê, heta niha rêkeftinek çênebûye. Ev jî nîşan dide ku nakokiyên di navbera Herêma Kurdistan û hikumeta Bexdayê de berdewam in.

Heke ev rewş wiha berdewam bike, hikumeta Herêma Kurdistanê jî neçar e careke dîtir ferandumê bixe rojevê. Balkêş e di rewşeke wiha aloz de êrîşên DAÎŞ'ê dîsa zêde bûn. Lewre dibe ku NY destwerdana vê rewşa kaotîk a Iraqê bike. Rûniştana 12'ê mehê ya NY'ê ya li ser rewşa Iraqê pêk hatî, weke nîşaneyeke vê dikare bê xwendin. Heta dibe ku dewletên dagirker ên Kurdistanê yên weke Tirkiyeyê jî, destê xwe bixin nav karê başûrê Kurdistanê, di bergîdana şerê li dijî PKK'ê de piştgiriya xwe ya ji bo referanduma Kurdistanê ji bo hinek aliyan ragihîne. Ev rewşa niha ya li Zînî Wertê diqewime, êrîşên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê pêk tên; alozî û nakokiyên di navbera hêz û aliyên kurdistanî de, nexasim jî yên li Herêma Kurdistanê; dîsa gefên li hemberî Îranê dikare weke nîşaneyên xurt ên vê yekê bên dîtin…

Gelo di rewşeke wiha de ji bo xizmeta gelên Iraqê rêkeftineke mayînde, aqilane û realîst a di navbera hikumetên Hewlêr û Bexdayê de pêk bê baştir e, yan jî referandûm?

Dr. Abdulillah Polat



## Vîrusa koronayê û psîkolojiya karantînayê

Divê hûn bi awayekî cihêreng li tedbîrên şexsî mêze bikin. Berî her tiştî, em zanin ku karantîna –cezayê nîhaî yê ragirtina li hundir– ji bo kesên jirêzê jî dikare rê li xirabûnên hişî veke. Li gorî hin xebatên demdirêj, piştî karantînayê hin nexweşiyên weke anksiyete, travmayên piştî bêxewî û stresê, zêde dibin. Helbet ev nexweşî di navbera ciwanan, ixtiyaran, mêran û jinan de di astên cuda de xwe nîşan didin.

Dibe ku her kes bibe mexdûrê vê rewşê. Ji ber vê yekê, ji bo tedbîrên wisa pêşniyar ev e: divê ji sedî sed gava pêwîst be, werin bicihanîn. Mesafeya bedenî girîng e. Li ser belavbûna vîrusa koronaya nû û derketina wê ya pêşî ya li Çînê gelek xebatên zanistî hatin kirin. Li wê derê tedbîrên pêwîst ên di warê gerûgeştê de nehatine wergirtin, tevî ku tê zanîn ku parastina mesafeya bedenî sebebeke girîng a belavbûna vîrusê ye. Ev tedbîr bi giştî weke 'Dûrahiya civakî' jî were pênasekirin, di rastiyê de ev ne peyvên herî rast in. Divê jê re mesafeya bedenî were gotin. Divê her kes bi xwe li ser çawabûna rewşa xwe biryara xwe bide. Tiştê herî girîng ê ku divê her kes der barê vîrusê de zanibe, pergala xwe ya imunîteyê -xweparastinê- ye. Em nizanin çi pergala immunitiyê zexim dike û ev yek derketina derve jî dide ber xwe. Hatiye îspatkirin ku li deverên zêde ne qelebalix, mesela li daristan, beyar û zeviyan meşeke bi qasî saetekê pergala xweparastinê zexim dike.

Xweragirtina li hundir zirarê dide pergala xweparastina bedenê. Ev yek nexasim ji bo malbatên bi zarok pir girîng e. Telefon, wisa xuya ye, medya herî civakî ya di destê we de ye. Twitter û Facebook ewçend ne baş in. Bi taybetî mijûlbûna bi kesên nenas re dibe ku ji we re nebaş be. Tenêtî nexweşiyeke vegir e. Ango ji mirovan digihîje hevûdin. Ev yek cara pêşî di 2009'an de ji aliyê komeke xebatê ya ku gelek dane analîz kirin hat vedîtin. Derket holê ku cixare kişandin û qelewî jî ji mirovan digihîjin hev, ango nexweşiyê vegir in.

Bi awayekî giştî, ev keşif di warê psîkolojiyê de demeke dirêj e tê zanîn. Hestên mirov di eslê xwe de vegir in, ji mirovan digihîjin hev. Ji ber vê yekê em xwe ji aliyê hestiyariyê ve jî enfekte dikin. Kesên ne xwedî pergaleke têrzexim a xweparastina bedenî ji kesên din zûtir dikarin bi vîrusa sar an jî vîrusa koronayê bikevin. Eynî weke kesên pêdiviya wan zêdetir heye xwe ji vîrusê biparêzin, kesên meyla wan ji bo depresyon û xemgîniyê heye jî divê êdî xwe zêdetir biparêzin. Mirov ji aliyê asta tirsa giştî ve ji hev cudatir in.

Hin kes hene, dema nexweşiyekê dibihîzin xwe dikin rizde û bend, hin xwe dikin weke mişkê hamster jî hene; lê hin kes jî hene ku dibêjin, nexweşî ne xema wan e. Dertên derve hevalên xwe dibînin an jî hewl didin ji vê rewşê sûdê wergirin. Lê belê piraniya mirovan, herî hindik ji sedî 70'yê wan di mijara danûstandinên civakî de bi awayekî xwezayî maqûltir tevdigerin. Di rojên dawî de bihîstina tiştên erênî, hinek be jî aveke hênik li dilê raya giştî dike.

Li vê qonaxa hevgirtina civakî gelek girîng e, mirov zêdetir pêdivî dibînin ku bi hev re biaxivin. Ji du metre dûr, lê belê ji berê zêdetir: Ez di heman demê de wisa difikirim ku ev qonax bû pêvajoyeke ku tê de hestên empatiyê bi pêş ketin, mirov ji berê zêdetir bi nirxa xwe û kesên derdora xwe hesiyan. Di rastiyê de, tiştekî xweş e ku mirov ji nû ve hay ji hev hebin û li hemberî hev bi baldarî tevdigerin. Bi dîtina min, ev ne klîşeyek e. Mirov ji dil û cidî ne.

# Pîr û kal tenê man

Pîr û kalên wekî hafizeya civakê tên pênasekirin û bi tecrûbeyên xwe rê nîşanî civakê didin di pêvajoya koronayê de ji hêla serdestan ve hatin îzolekirin û terkî mirinê hatin kirin

Navenda Nûçeyan



Welatên ku herî zêde ji vîrusa koronayê (Covid-19) bi bandor bû Amerîka, Îngilistan, Îtalya, Spanya û Fransa ne. Tirkiye jî di rêza 9'emîn de cih digire. Gelek beşên civakê ji pêvajoya vîrusê bi bandor bûn. Feraset û hişmendiya serdest di vê pêvajoyê de bêtir pîr û kal kirin hedef, bi tedbîrên xwe ji civakê dûr xistin û wan terkî mirinê kirin.

Civak, ji aliyekî ve ji hêla vîrusê ve û ji aliyekî din ve jî ji hêla pergala serdest ve hat dorpêçkirin. Pergala serdest a dixwest civakeke ezperest biafirîne bi vîrusê re gihaşt armanca xwe. Tirs, fikar, birçîbûn, tenêbûn, mirin, jiyan, malbat, zarok, aborî û pêşeroj di pêvajoya vîrusê de derket asta herî jor. Ev tişt bi xwe re cudakarî, newekhevî û nijadperestiya heyî derxist asta herî jor. Her qadên jiyanê û civakê para xwe ji vîrusê girt.

Di destpêka pêvajoya vîrusê de heta îro dewletan hewldane ku hêza xwe ya serdestiyê winda nekin û xwe di nav civakê de xurt nîşan bidin. Xurtbûna xwe bi girtina tedbîran û serkeftina xwe jî bi kêmkirina daneyan anîn ziman. Lê hê jî vîrus belav dibe û bi milyonan mirov bi vîrusê dikevin û bi sedhezaran kes jî jiyana xwe ji dest didin. Li gelek welatan tedbîr hatin sistkirin û plansaziyê pêşerojê hatin derxistin. Bi taybetî hemû hewldanên dewletan ji bo sererastkirina aboriyê ye, lê wisa xuya dibe ku dewlet û sermayedar dê bi hev re berdêla vê pêvajoyê ji karker, kedkar û xizanan derxînin.

### Hişyarî veguherî êrîşan

Tedbîrên ji destpêka pêvajoyê heta îro hatin girtin bêtir rê li ber cudakarî û newekheviyê vekirin. Li tevahiya cîhanê di serî de pîr û kal hedef hatin girtin û ji bo wan bangewazî hatin kirin. Bi taybetî jî ji bo pîr û kalên nexweşiyên wan ên kronîk hene hişyarî hatin kirin. Hin welat bangewazî kirin û hin welatên wekî Tirkiyeyê jî ji bo pîr û kalan biryara qedexeya derketina derve îlan kir. Bi biryar û bangewaziyan feraset û nêzikatiya li hemberî pîr û kalan veguherî êrîş û cudakariyê.

### Pîr û kalan terkî mirinê kirin

Bi taybetî li welatên Ewropayê jiyana pîr û kalan ket xetereyê. Li gelek malên xwedîkirinê yên pîr û kalan bê xwedî man û pîr û kal terkî mirinê hatin kirin. Her roj agahiyên mirina pîr û kalan ên li malên xwedîkirinê hatin parvekirin. Di rojên ewil de li Fransayê 4 hezar û 589, li Îtalyayê 3 hezar 859 pîr û kal li malên xwedîkirinê ji ber bêtedbîriyê jiyana xwe ji dest dan. Li Almanyayê jî nêzî 11 hezar malên xwedîkirinê hene û bi sedan pîr û kal li vir jiyana xwe ji dest dan. Li Amerîkayê jî heman tablo hebû. Gelek welatan ji bo cih ji nexweşên din re bimîne pîr û kalên rewşa wan nebaş ji nexweşxaneyan hatin derxistin û terkî mirinê hatin kirin. Bi taybetî di daneyên li gorî qeydên fermî tên amadekirin de mirina gelek kesan derbas nabe.

### Ji civakê hatin dûrxistin

Gelek cih ji pîr û kalan re hatin qedexekirin. Pîr û kalên bêkes di vê pêvajoyê de neçar man hewcedariyên xwe bi xwe pêk bînin. Dema derketin derve jî bi êrîş û heqaretê rûbirû man. Ev tişt têr nekir dîmenên êrîşan hatin kişandin û li ser medyaya civakî hatin parvekirin. Wekî gunehkarên wê pêvajoyê hatin îlankirin. Di vê pêvajoyê de wek kesên nayên xwestin hatin ragihandin. Mafên wan ên jiyanê bi her awayî hat binpêkirin. Êdî pîr û kal ji civakê hatin dûrxistin.

Bîlançoya her roj dihat parvekirin li ser civakê bandoreke neyînî dikir. Lê belê feraset û hişmendiya pîr û kalan bi mirinê re rûbirû hiştiye bala civakê nekişand. Pîr û kalên hafizeya civakê ne û bi tecrûbeyên xwe yên bi salan rê û rêbaza jiyanê nîşanî civakê dane, di vê pêvajoyê de bi tenê hatin hiştin. Civaka ev qas ji vîrusê ditirsiya êdî li hemberî êrîşên li dijî pîr û kalan refleks nîşan nedida. Pîr û kal bi mirinê re rûbirû hatin hiştin.

## Xizan dîsa bûn qurbanên sereke

Krîza aboriyê ya ji ber vîrusê bêtir kûr bû bondor li tevahiya jiyanê kir. Dezgeha Alîkariyê ya Îngilistanê Oksfam diyar kir ku piştî vîrusê dê bi giştî li cîhanê milyarek zêdetir kes dê di asta xizaniyê de jiyana xwe bidomîne. Ji ber ku li welatên xizan pergala tenduristiyê qels e, bidestxistina derman û zadê kêm in bêtir bi vîrusê bi bandor dibin.

Li gorî daneyên Yekitiya Neteweyî (NY), di nav 3 û 6 mehan de krîza aboriyê li welatên xizan dê derkeve asta herî jor. Her wiha NY'ê ji bo parastina tenduristiya welatiyên li Benin, Cîbûtî, Lîberya, Mozambîk, Pakistan, Filîpin, Sierra Leone, Togo û Zimbabve banga alîkariya aboriyê kir.


Seroka Fona Pereyan a Navneteweyî (ÎMF) Kristalina Georgieva, da zanîn ku ji ber vîrusa koronayê deyn pere dane 25 welatên endamê ÎMF'ê. Georgieva, destnîşan kir ku dê bi deyn pere bidin welatên xizan ên wekî Afganistan, Benin, Burkina Faso, Komara Navîn a Afrîkayê, Çad, Girava Komorê, Komara Demokratîk a Kongoyê, Gambiya, Gine, Gîne-Bissau, Haîtî, Lîberya, Madagaskar, Malavî, Malî, Mozambîk, Nepal, Nîjer, Ruanda, Sao Tome ve Principe, Sierra Leone, Solomon Adaları, Tacikistan, Togo û Yemenê jî.

300 parlamenterên 20 welatan bang li ÎMF û Bankaya Cîhanê kir û xwest deynê welatên xizan jê bibin. Nûnerê Demokratan Îlhan Omar û senatorê amerîkî Bernîe Sanders pêşengiyê ji vê hewldanê re dikin ji bo welatên xizan banga alîkariyê kirin û her wiha daxwaza betalkirina deynan kirin.

Fona Alîkariya Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNÎCEF), jî bi daxuyaniyekê bal kişand ser rewşa zarokên li welatên xizan dijîn û da zanîn ku li welatên xizan bêtir zarok ji vîrusê bi bandor bûne. UNÎCEF, bal kişand ser lêkolîna Zanîngeha Amerîkayê Johns Hopkînsê û got: "Li gorî lêkolîna zanîngehê li 118 welatan di nav 6 mehan de dibe ku 1,2 milyon zarokên ku temenê wan kêmî 5'an be ji ber bandora vîrusê bimirin."



## Bila aşî ji bo her kesî bê pere be!




Ligel tedawiya ji bo vîrusa koronayê tê kirin jî lêgerîna aşiyê didomin. Ajansa Dermanan a Ewropayê destnîşan kir ku dibe di nav salekê de aşiyek bê amadekirin. Ligel lêgerîna aşiyê ji niha ve di navbera dewletan de gengeşiya aşiyê derket asta herî jor.

Fîrmayeke dermanan demên borî diyar kiribû ku heke aşiyek bê dîtin jî dê pêşiyê pêşkeşî Amerîkayê bikin. Daxuyaniya fîrmayê ji hêla rayedarên dewletan ve hat rexnekirin. Serokkomarê Fransayê Emmanuel Macron jî bertek nîşanî daxuyaniyê da û got: "Divê bazara aşiyê neyê kirin. Divê aşî bibe milkê raya giştî ya gerdunî."

Pispor, siyasetmedar û rêveberên rêxistinên sivîl ên civakî û di nav de Serokkomarê Afrîkaya Başûr Chrîl Ramaphosa û Serokwezîrê Pakistanê Îmran Han jî heyî zêdeyî 140 kes nameyeke hevpar ji bo civîna Meclîsa Tenduristiyê ya Cîhanê amadekirin. Name di civînê de wê pêşkeşî wezîrên tenduristiyê yên dewletan bê kirin. Beriya civînê name ji raya giştî re hat parvekirin. Di nameyê de wiha hat gotin: "Dema aşiyeke bi bandor hat çêkirin, divê bi lez û bez bê hilberandin. Divê aşî bê pere bidin hemû welatan. Divê derman û aşî di bin sîwana Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê de be."

# Bajaroka Awîskê

Ayhan Erkmen



Awîskê, girêdayî navçeya Qubînê ye. Ji Qubînê heft û ji Êlihê bîst û heft kîlometreyan dûr e. Li navenda Awîskê 3 hezar 500 kes dijîn. Her çiqas ev der li warên êzdiyan be jî roja îroyîn di navenda Awîskê de êzdî qet nemane. Ji wan yek du mal kişiyane gundan, yên din jî koçber bûne ber bi welatên biyanî. Di bintara Awîskê re çemê Bişêriyê dikişe. Li ser çêm du pir hene ji wan yek sedsale ye û trêna Misircê di ser re derbas dibe. Di vê dawiyê de van her du piran navê xwe dane Awîskê û navê Awîskê hatiye guhertin, bûye 'İkî kopru' ango du pir. Dema êzdî li vir dijîn malên wan hema li ser kaşê jora çêm in. Lê bajarok niha ber bi gundê Qorixê ve fireh bûye.

Di dîroka Awîskê de şopeke êzdiyatiyê ya xurt heye. Demekê bi navê Awîskêya Elî Tem hatiye binavkirin. Elî Tem Nebiyê Mîrza Axayê mezin e.

Li gorî lêkolîneran Mîrza axa di navbera salên 1640 û 1720'î de serdariya welatê Xaldiyan kiriye. Ji pey wî jî Temê kurê wî bi heman peywirê rabûye. Dema siwarê Barîn, bavê Elî, Temê Mîrza axa, di sala 1800'î de koça dawî dike, wî di ziyareta Şêxevind de vedişêrin. Ziyaret li geliyê bintara awîskê û di ber sînorê gundê Heciriyê de ye.

Kerametên ziyareta Şêxevînd hê jî tên gotin. Bo kesen nexweşiya bê ketibin, aliyekî wan kişiyabe an jî bi tirsê ketibin, zîyareta Şêxevind şîfa ye.

Li gorî salixdayînan, dema êzdî koçber nebibûn û welatê Xaldiyan hêj şên bû; her sal, li ziyareta Şêxevind, li roja şemiya ku dikete dawiya meha gulanê, pîrozbahiyek mezin çêdibû. Hemû gund li hev komdibûn, qurban serjê dibûn, def û zirneyan lêdixist, stran dihatin gotin û govend digeriyan.

Lêkolîner Kemal Tolan li ser ziyaretên herêma Xaldiyan gelek xebitiye. Li gorî zargotina ji Hesen Xelef girtiye, dibêje ku;

'Li wextê hîna pir mirov li derûdora geliyê Şêxevind tunebûne, hingê her kes weke koçeran dijîn; carekê, dema koç, ji geliyê Şêxevind bar dikin û diçin, zarokek piçûk li dewsa warên koçeran, bi tenê dimîne. Zehf digirî û lewaz dikeve. Şêxevind tê hewariya wî, bi qudret û kerametên xwe, ji xezalekê re dibêje ' were, şîrê xwe bide vî tifalî.' Xezal bi şîrê xwe wî zarokî xwedî dike. Kurekî gelekî bedew jê dertê. Hinga lawik tê çaxê zewacê, Şêxevind rojekê bi şiklê derwêşekî tê cem kurik û dibêjê, 'Divê tu biçî gundê Şimzê, li wî gundî qîzeke bi navê Xanê ye ku gelekî bedew û delal dijî, ew mirazê te ye. Serê sibê, zû here û li ser kaniya Şimzê bisekinî, ya ku ewil tê û avê dibe Xanê ye. Tu xwe nîşanî Xanê de û destê xwe di pişta wê de bêjê; ez mirazê te me. Ji dûra vegere ciyê xwe, ji dawiyê Xanê yê li pey şopa te keve û were cem te.'

Lawik tê nav gundê Şimzê weke şîreta Şêxevind tev digere. Gava lawik destê xwe li pişta Xanê dixe, şûna destê wî li ser pişta Xanê dibe weke şaneyekê. Piştî demekê, ev şane mezin dibe û Xanê nikare ji şermana derkeve derva. Dê û bavê Xanê wê dibin li ser hekîm û loqmanan, lê dikin û nakin tu çarekê ji derdê Xanê re nabînin.

Rojekê Şêxevind tê xewna dê û bavê Xanê û ji wan re dibêje, 'eger hûn vê keça xwe nebin û bi wî xortê li geliyê Şêxevind re nezewicînin, keça we yê bi wê kederê bimire.' Dê û bavê Xanê dibêjin 'de ev xewn e' û guh nadinê. Axir Şêxevind çend caran dîsa tê xewna wan û heman tiştî dibêje. Dê û bavê Xanê jê bawer dikin û Xanê bi wî lawikî re dizewicînin û Xanê ji wî derdê bêderman xelas dibe û digihîje mirazê xwe.

Mexberê Temê Mîrza Axa jî di ziyareta şêxevind de ye, lê halê ziyaretê dilê mirovan diêşîne. Darên wê yên sedsale hatine birîn, cih bi cih hatiye kolandin. Li cihê mexberan jî nayê xuya.

Ji Tem du kur dimînin wan Elî Awîskê, Zoro jî Zivingê bi cih û war dibe. Ev her du gund bi navê wan tên zanîn; Awîskêya Elî Tem û Zivinga Mala Zoro. Pey bavê xwe serdema Elî Tem dest pê dike û qedera Elî jî ziyareta Şêxevind diyar dike.

Nivîskar Orhan Basî di vê mijarê de dibêje ku; 'Çavê Elî Tem di pîrozahiya ziyareta Şêxevind de keçekê dikeve, keçik bi siwarî berxekî ji erdê hildide û davêje ber xwe. Elî dibe xwezgînî lê bira û pismam razî nayên ji ber ku wê demê eşîr tenê bi hev re dizewicîn. Elî ji eşîra şedikiya ne û keç jî ji eşîra Pîvaziya ne. Elî ya xwe dike bi keçikê re dizewice û xwişkên xwe Şîrîn û Gulê jî hildide ji welatê Xaldiyan koça xwe bar dike diçe Cizîrê.'







Ji Elî du kur çêdibin, Qaso û Hemîd, leheng in û bi xweşmêriya xwe tên nasîn. Hemîd berpirsiyarê siwar û serleşkerên mala Mîr Bedirxan e. Li dema Eliyê bavê wan dimire, Hemîd ji her du metên xwe; Şîrînê dide Bedirxan Beg û Gulê jî dide Salih Beg ê di dawiyê de Hemîd navê êzdiyatiyê jî ji ser xwe hildide. Ev yek ne bi dilê Qaso ye û Qaso ji Cizîrê bar dike diçe gundê Basa. Nebiyên Hemîd hê jî li Silopiyayê dijîn.

Ji Qaso jî gelek zar çêdibin. Heya fermana Basa zar û nebiyên wî li Basa dimînin. Di 14' ê Gulana 1916'an de hem êzdiyên li Basa, li ber çemê Xabûrê tên qetilkirin; ji heştê malî bi tenê heft mal, ji hefsed neferî bi tenê sî û heft nefer dimînin. Ji wan sî û heft neferan yek jî Simoyê Silo yê nebiyê Qaso ye. Simo şûnde berê xwe dide welatê kal û pîran tê herêma Xaldiyan.

Ji mala Mîrza Axayê Mezin hin kes, ji piştî ewqas ferman û têkçûnan, hin bernavk û navên bavikên xwe li xwe kirine û navê mala Mîrza Axa ji ser xwe rakirine; Şedîkî, Basî, Çêlikî, Qizilî, Berekî ji wan malbatan çendek in.

**Çavkanî: Gotarên lêkolîner û nivîskar Kemal Tolan û Orhan Basî**



Reyhan İke

## Divê em bitirsin carna

*Erê delala min dizanim wê jiyan bibe jan*
*Bibe goristana xewnan ev bajarê bibirq*
*Li vî bajarî wê herkes gora xwe bikole*
*Û bibe fermana xwedayî xwekuştin*
*Dizanim ger carek din em hev bikujin*
*Wê êdî ti caran têr nebe ji xwînê ev xak*
*Miriyên me wê pirtir bibin ji saxan*
*Dê şevên me yên nazdar ber bavêjin*
*Û dilê me li kefenan bê pêçan her roj*
*Ka bipirse ma kurdek heye ku nezane*
*Ji êşa qolincan binjan dibin kenên me*
*Ji êşa vê birînê ye diqurçifin şadiyên me*
*Û xwîn digirîn kanî, çem û robarên me*

Ev rêzikên li jor naveroka gotinên dayikek ji bajarê Silêmaniyê ye. Dayikeke ku kurê xwe di şerê navxweyî de ji dest dayî. Dayikek ku êş û azara şerê navxweyî ji êşa kezeba xwe dizane. Di be ku li hinek cihan bilêvkirina hinek gotin û peyvan ne ewqas giran be û wateya wan razber be. Lê li devereke wekî başûrê Kurdistanê ku di şerê navxweyî de windahiyên mezin daye, îhtîmal û gotina şerê navxweyî jî tayek giran dixe dilê mirovan. Ji ber ev gotin biranînên bi jan tîne bîra mirovan, şênber e li ser vê xakê.

Ev demek e li herêma Zînî Wertê bûyerên diqewimin û civaka me dixin nav tirsê, hêj dewam dikin. Tevî bangên gelek rêxistin, sazî û dezgeh, rewşenbîr û hunermendên kurd jî hêj pêngavek ku tirsa xistî nav civaka me ji holê rake nehatiye avêtin. Li ser bangên hatin kirin ji Koma Civakên Kurdistanê KCK û Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê bersivên erênî hatin dayîn. Di daxuyaniyên ji aliyê KCK û PKK'ê ve hatin dayîn de daxwaza diyalogê û bangên sazkirina yekîtiya neteweyî ya kurd hatin ziman. Lê mixabin hêj bersiva van bang û daxwazan ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve nehatiye dayîn û metirsiya şer ji holê ranebûye.

Lewma bi rojane ev tirs bûye wekî badarê û xwe li dilê mirovên welatperwer, dilsoz û jiyanhez dipêçe. Lê ya rast ne şerm e mirov bitirse, bi taybetî dema mijar dibe hevkujiya kurdan, xwekujî an ku birakujî. Ji ber hêj devê birînên me yên di encama şerê xwekuştinê de vebûyîn qalik negirtine. Ji vê ye xewnên bajarên me yên bi birq, kenê li ser lêvên me, şadî û coşa jiyana me tê û li çelakê pirsek dijwar dialiqin; gelo dibe ku cardin ev jan xwe berde dilê gelê kurd û birînên nû li giyana mirovên vê xakê bên vekirin? Gelo dibe ku cardin partî û rêxistinên kurdan berê çekên xwe bidin hev û keyf û kenê neyarên vî gelî bi xwe bînin?

Erê em kurd bêtirs û zîrek in. Di şeran de leheng û wêrek in. Ev yek ji aliyekî ve cihê şanazî û serbilindiyê ye ji bo me kurdan. Ji dîrokê heta îro tişta herî zêde pesnê kurdan pê tê dayîn ev e. An ku wêrekiya kurdan a di şer de ye. Lê divê em bitirsin carna. Em ji çi bitirsin; ji hevkuştinê, ji polîtîkayên dikevin xizmeta neyaran, ji hewlên parçekirin û dûrxistina me ya ji hev, ji neguhdarkirna hewar û gaziyên me yên yekitî û hevgirtinê, siyaset û nûneriyên şaş ên ku di vê sedsalê de ji ji bo berjewendiyên biçûk koletî, kuştin û mirinê bikin para me. Bi kurtî hemû hewldanên li dijî têkoşîn û berxwedana me ya bi sedsalan, hêvî û xeyalên me yên azadiyê û hemû polîtîkayên zerarê didin destkeftên têkoşîna gelê me yên di encama berdêlên giran de hatin bidestxistin. Lê divê tirsên me berê me nedin bêdengiyê, berê me nedin bi neçarî pejirandina hinekek sepandinan û em ji her demê zêdetir li hemberî xwediyên van kiryaran dengê xwe bilindtir bikin.

Ji ber hemû tirs ne ji tirsonekiyê û hemû wêrekî jî ne ji biaqilbûnê tên. Bêtirsbûna me ya li hemberî hevkuştinê wê bê wateya me waneyên pêwîst ji dîrokê negirtine û hevsarê hişê me hêj di destên hinek din de ye. Lê divê em ji vegotina daxwaz û ramanên xwe netirsin. Lewma divê her kurdek li cihê lê dimîne dengê xwe bilind bike, bêtirs û fikar hizrên xwe vebêje. Ji bo vê gelek înîsiyatîfên cuda dikarin bên sazkirin. Derfeteke wekî înternetê di destê me de ye. Bi riya înternetê be jî em hemû dikarin Kongreya Netewî ya Kurdistanê wekî birkekî ya kombûna hizr û ramanên xwe binirxînin, nêrîn û daxwazên xwe bi peyam, name, kampanyayên îmzeyan û curbicur rêbazên din bigihînin kongreyê. Ew jî dikarin dengê me bigihînin hemû partî û rêxistinên kurdan ên siyasî. Helwesta partî û rêxistinan ya li hember daxwaz û ramanên me, wê riya rast a têkoşînê jî nîşanî me bide. Em dikarin bi nêrîn, daxwaz û ramanên xwe, bi dengê xwe siyaseta partî û rêxistinên kurdan di referandumekê re derbas bikin. Wê helwesta rast berê dengên me diyar bike û dengê me jî bikare siyaseta kurd beralî bike. Ji ber em civak in, angaşta wan a bûyîna nûner heye. Bêguman, rola partî û rêxistinan a pêşengiyê heye. Lê di rastiyê de ti rêxistin û partî jî bêyî civakê nikarin bijîn. Wê demê di diyarkirina çarenûsa xwe de divê em xwedî gotin bin û em deng bidin ên ku rêz didin daxwaz û ramanên me.

# Dager





Mehmet Seyîtalîoglu

Keyeyî waranê Çîyapanike de benê. Dewijî di hîrê aşmî îta manenê. Mal û dawar, zaw û zêç, berxwanî, şiwanî, gawanî pêropîya puşopalaxe çiraynenê. Heywananê xo bi weyîkerdene kene mird. Cênî, şit û mastan, ron û toraqanê zimistanî arêdayene. Çerê mal û dawarî beno kemî û waxtê xo beno pir. Waxtê dagêrî êno. Na rû/semed ra, keyeyî barxanê xo amade kenê û dagere dewe benê.

Dora dagerî êna. Çîmîyê xo, tef û talê keyeyane xo amede kenê û kenê zereyê galê û turikan. Tayê xo, baranê hera, tayê çî yê xo kî erebeyê gaya, o ke nêbo, ebe xizagê gayan rê kom kenê û ebe înan dager benê dewe.

Nê keyeyânê dewe mîyan de keyeyê Memedê Safî kî esto. O kî têf û talê xo keno kom. Xizagê xo amade keno û ey û tornê xo şonê ware. Cilcor û toraqa, rona xizag ra bar kenê. Kergî manenê. Xase veyva keyeyî ya. Xanıma Memedê lajê Memedê Safî'ya. Sebeta girêdayena linganê kergan, derdormê de lak ro nîyadane. Derdorme de lak û luk ra qêt çîyê nêmendo. Peynîyapêyêne de silondî ser o paçêde kan vînenê. Ebe nê paçî linganê kerge û dîkî girê danê. Xase kerge û dîkî dana Alî dest û kunê re raye.

Alî serre ra hurdî yo. Demê ra dime qefêlîno. Kerge û dîkî Alî ra cênê û resenê xizagî ra girê danî.

Alî, tornê Memedê Safî yo. Pîyê xo hardlerzê Gimgimî yo peyên de binê banî de mendbî û şîbî heqîye. Alî sê mend bî. Qijê hîrê birayan o bi. Alî, kalikê xo dima ra raye teqîp keno û ver bi dewe şono. Xizagê gayan, binê gole ra dernişîn ke beno, gayî hetanî dewe ebe waştîş şone. Alî tepîya maneno. Dîk û kergî, se ke kenê laqê linganê xo wisnenê. Dîk remeno û kuno birrê qawaxî mîyan. Alî nêtawreno ke dima dîkî şoro. Çimkê kergî bewayîr manêne. Alî 'cu cuu…' keno. Kergan ano te lewe, la dîk qêt tepîya êno? Çare tede nêvîneno. Pey vilê xo kineno, ebe ters êno reseno keyeyê kalikê xo.

Kalikê ey, xizag ra tefûtal onceno zere. Verê kêberî/çêberî de nîşeno ro. Tasêko doye şimeno. Ebe tornê xo Alî şa beno. Qayt keno ke Alî muruzun o. Ci ra vano: "Hela bê lê kalikê xo. De hela bê, ez qurbanê binê linga to bî, se bi mi ra vajê." A şop, demarî ya pîyê Alî zêre ra vêjîna û vana: "Dîk kerdo qurbanê xo dîk! Coka muruzun o. Qurbanê dîkî bo sala!"

Eke pirîka xo ya raştkîne bîyêne, nîya nêvatêne.

Memedê Safî zaf zere veşaye bî. Hetê ra zere germî yê, heto bîn ra kî dîk. Hetê ra zereyê xo vêşeno hetê ra kî xo xo de qarîno. Hersî ver sere de aqil nêmaneno. Bê qerar manêno. Demê ra dime kuno zere baraqa. Tifangê awcî cêno û Alî fîno ra xo dime. Şaneno raya warî. Êne duştê qawaxî. Alî ebe tilîya ca yê dîkî kalikê xo rê salix dano. Vano: "Dîk îta xelesîya ra. Na dûşt de kêwt qêwaxan mîyan û bî vîndî." Kalik 'cu, cuu' kêno. Qêt veng û vajê dîkî çîn o. Hetanî şan manenê. Belkî wa dîk veng ro xo fî yo. Demê ra dime vengê dîk êno. Şaş benê. Her dolim tumê ra vengê dîkî êno. Kamta şorê. Ebe na şaşî ye orte de manenê. Roj koya serde beno wîndî. Cêrenê ya û êne keyeyê xo.

Ebe no qeyde roja bîne vengê dîkî ro xo cêne û şonê Çala Sîyaye. Vengê dîkî na dolim serê Keloşkê ra eno. Senê Saya, verqefê Gomê Gule de ro vengê dîkî. Dîk Gomê Gulê de veng fîno re xo. Ver çarnenê uja. Çend gamî ra dime pey Qorî ro, tapê Kurê Jarîye ra vengê dîkî êno. No veng, vengê dîkê sûrpelî ra dot vengê çîyê de bînî nîyo. Xeylî qefelîyê. Zanîyanê înana de teqate nêmenda. Pey ser cerenê ra û êne dewe.

Der û cîranî na mesela pehesînê. Şan de keyê Memedê Ap Safî de enê pêser. Hesenê Wêlî, İbrahîmê Qemerê Mele, Memikê Şexalîya û çend kesê bînî mesêla dîkî anê ra û xo mîyan de qesê kenê. Tayê cîranî vanê: "Ma dîkê to şîyo, ma dîk danîmê to. Xo mêakesne." Memikê Şexalîya vano: "Na dawa endî bîya dawa namusî. Gere ma nê dîkî doz bikîme."

Roja bînê şodir xêlî xort û arazî zanayî, rêberîya Memikê Şexalîya de vêjinê sere dewe û binê qevaxî saye kenê. Çîyê nêvînenê. Ap Memed êno reseno cîrana û vano: "Bêqeretîye nêbena." Tornê Ap Memedî Alî êno xo resneno ci. Şar êno xo resneno verê Hopike, vengê dîkî eno. Her kes mat beno. O jû tilîya/beçik xo hetê Warê Kemerî ser keno derg, o bîn Merga Qerî ser, ê hîreyîne Tapê Kurê Jarîye ser tilîya xo keno derg. Sond waneno ke vengê dîkî na wo îta ra êno. Memikê Şexalî peroyîne keno zurekêr. Verojê Kela musnêno şarî. Nê cîranî xo mîyan de munaqaşê der ê o şop dîk reyna, 'uurru uu…' veng dano. Tumî, tapî, koyî, deştî û duzî, verojî, kaş û kuşî perûne ra vengê dîkî êno. Çala Sîyayê, Keloşkê, Sênê Keloşkê, Sênê Saya, Gomê Gûlê, Pê Qorî, Gomê Usî, Çala Wêysî, Derê Xêymê, Textê Merga Qerî, Bejê Qûtê, Xirx, Zimê, Sayreke, Çala Talana, Warê Bezê, Verojê Girî, ûsn. Ra veng safî nêbeno. Vatenanê şuyana û gawana hêtanî payîzo pêyen tum û çalan ra o veng amêne.

Gorê vatena, hetanî nê seranê pêyênan, oyo ke zerepak o, heqê xo de haşt o, geganê vengê dîkî heşneno.



# Feydên Coronayî

Ehmedê Bira

Her cano ke bi ganin û nîm ganin semedo ke birînanêy xo derman bikero kîmya xo bedilneno û xo tamîr keno. Dinya zî caneke ya. A zî hedî hedî xo bedilnena û birînên ke ma merdiman canê ayî de akerdêy tamîr kena ra xoverdayişî de ya. Ewro dinyaye bi vîrusa Coronayî hişyareya sifte a tamîrkerdişê canê xo daya. No zî feydeya dinyayî û feydeya ma heme gandaran a. Eke ma nêy hişyarîyan dîqet mekerêy se zey Tofana Nûh î tofanêy girdan wexteke kilmek de ma ver de yê.

Na gam dewletîy heme Coronayî hinî dane dasinasnayiş ke 'zaf zirar dana merdiman' mojnenêy. Kişta ewnîyayişê dewletan ra raşto. La kişta berdewameya weşeya pêroyinê dinyayî û fezayî çepê ci ya. Çimkî dinya xo newe kena ke umre xo derg bibikera ke fezayî de payan ser de bivindera…

Ez zani şima zaf meraq kerdo ke feydeya Coroyî ka ciçîyê. Ez bi kilmek xal bi xal binuşnî;

**1 –** Coronayî ra taxmînên min seyî 90 yê balafiran yanê ûçaxan ewro nêperenêy. Dewletîy nêvanêy la seyîra 60 ê ozonî balafiran qul kendêy. Çimkî zaf çor de perenêy û gaza ke vejenêy ze rîyê erdî nêşneka bi va û tîncî bêro parzûnkerdişî û bêparzûnkerde raşte raşt gaza balafiran geneno ozonî û birînên zaf girdan roj bi roj akenêy û no zî beno semede germaheya gilobal yanê gilokine… Zey nimûne fotoya keskesora ke Amedî de ameyo ontiş. Hîndîstan de fotoyo ke ameyo ontiş û verî ameyo ontişî şaristanêy ke nîyameyê vînayişî biç iman vînîyayo…

**2 –** Feydeyeke bîn zî merdimêy ke kewtêy bin lepê kapîtalîzmî û bîyê rîberal ewro zafêreya înan mecbûr mendêy ke komînal bicuyê. No zî tayn bo zî rayîra konfederalîzmî dayo akerdiş. Yanê rayberên konfedaralîzmî dewra coronayî de eger weş têbigeyrê beno ke pergala konfederalîzmî hemeyê dinayî de bêro cuyayişî û dinya birînanê xo ra rewtir bixelisyo û felaketan meyaro biganinan ser…

**3 –** Bi her hawayî Coronayî bezîrganeya dinayî daya vindarnayişî. Davindarnayiş zî bi sere xo rayîra Konfederalîzmî de cuyayişê komînal û xozayî avera berda û lîberalîzmî peyde verdaya. No zî dayo mojnayiş ke lazimo heme merdimîy kêyên ekolojik û yew an zî di qatinan de bicuyê, bax û bexçeyê xo hewşa xo de bironê û bişikyê muhtacê pereyan û fabrîqeyan nêbêy û cuyayişê xo bi serran hewşa xo ra berdewam bikerêy…

**4 –** Kişta bînî de zî semedo ke zafêreya fabrîqeyan zî kar nêkenêy an zî tayn kenêy ra kiştê ra lojina înan ra gazên xirab nêvejyenêy ra, amûrên şerî û petrolî tayn bîyê ra xozayî de va pak bîya. Kişta bînî de zî wesayitên rayîran heta ke mecbûr nêmanêy rayîra nêşinê ra zî xoza pak bîya û bine erdî ra petrol tayn vejyena…

**5 –** Feydeyek bîn zî merdiman weş famkerdo ke lazimo merdimîy bi dengeya xozayî kaymekerêy û weşeya merdiman û biganinan girêdayê weşeya dinayî ya.

**6 –** Rayekebîn ameyo famkerdiş ke enerjîyêy xozayî bi her hawayî herî baş êy û yên bînîy dengeya xozayî xeripnêy…




# Ga û ker

Du sofî di meha Remezanê de diçin li gundekî dibin mêvan. Niyeta wan xwarin û vexwarina belaş e. Lê gund, gundê Qizilbaşan e. Demekê li hal û rewşa hev dipirsin. Dakere vedibe diaxivin. Ji sofiyan yek diçe daşirê.

Xwediyê malê ji sofiyê din dipirse dibêje: “Hevalê te mirovekî çawa ye, ilmê wî heye yan na?” sofî ji bona peznê xwe bide dibêje: “Lo dev ji wî gayî berde, mirovekî wek ga ye tu tiştekî ji dinyayê fam nake.”

Piştî qasekê îcar ê din diçe daşirê û xwediyê malê ji sofiyê berê çûbû daşrê dipirse dibêje: “Ev hevalê te mirovekî çawa ye, ilmê wî heye yan na?” Vê carê ev sofî quretiyan dike û dibêje: “Dev ji sofiyê hevalê min berde kerekî çarpê ye. Ker e tu tiştekî ji dinyayê fam nake. Nezan e.


Piştî ku dibe êvar û wexta fitarê xwediyê malê hinek ka û hinek ce datîne ser sêniyê û tîne dide ber wan. Her du sofî ecêb ecêb li hev dinêrin û ji xwediyê malê re dibêjin: “Qurban ev çi ye, ma tu tinazê xwe bi me dikî?”



Xwediyê malê dikene û wiha dibêje: “Ji we yek ga ye û ê din jî ker e. Ma ji ga û kerê re ji ce û kayê xweştir xwarin heye."

**Fikrî Amedî**

## XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3.Notayeke muzîkê 5.Kevir, kuç 7.Hêsir barandin 8.Dayik 9.Fikir 13.Hilweşîna berfê 14.Bersiva erênî 16.Kok, damar 19.Mirov 20.Agir 21.Bêpêjin, bêdeng 22.Qada şer 25.Hewa 26.Salnameya islamî 28.Seqem, hewaya sar

### JI JOR BER BI JÊR

1.Alaveke kevin a ji bo hilgirtina baran 2.Kesê ji dê û bavê mirov 3.Jina hevjînê wê dimire 4.Rengek 6.Navê eşîreke kurdan 10.Heywanek bi saw û jehrî 11.Nazik, tenik 12.Hejmarek 15.Danekî rojê 17.Veguhestin û nêzîkirina tiştekî 18.Cilekî mêran, bi taybetî ereb li xwe dikin 20.Xaniyê sewalên kedî tê de tên xwedîkirin 23.Pêxemberek 24.Kurt, ne dirêj 27.Rojeke hefteyê

**Bersiva hefteya borî**




Şûjin

**Dildarê Amedê**

## Meha Remezanê

Bawermendên hêja û bi rûmet maşala îsal rojî pir xweş derbas dibe, mirov bi xwe nahise hew te dît bû êvar. Mirov ne tî ne jî birçî dibe. Vaye nîvê rojiyê derbas bû hîna germahî nehatiye. Bi rastî em îsal gelekî ji meha remezane razî û memnûnin. Min wiha got serpêhatiyeke Behlûlê Dîn hat bîra min. Ji xwe gelek serpêhatiyê vî karekterê hene û her gelekî li gorî xwe navek lê kiriye. Ereb dibêjin Ciha, tirk dibêjin Xoce Nasrettîn û kurd jî dibêje Behlûlê Dîn an jî Behlûlê birayê Harûn el Reşîd ku mirovekî qencê xwedê bû. Bi her halî em vegerin ser mijara xwe ku çîrokeke wî ya der barê meha remezanê de.

Tê gotin ku carekê mirovek ji Behlûl dipirse û dibêje; seyda em ji rojiya remezanê memnûnin gelo ew jî ji me memnûne? Belûl dibêje wele lî gorî ez dibînim ew ji me bêtir memnûne, ma ku ne wiha bûya dê çima her sal 10 rojan beriya wextê xwe bihata û bûbûya mêvanê me, heke ne memnûn bûya dê salekê nehatiba.

Piraniya zarokan jî wekî her carê dîsa her êvar ji dê û bavê xwe re dibêjin îşev me jî rakirin paşîvan em ê rojî bigirin, kesên ku bi ya wan dikin û wan radikin paşîvan ew heta nîvro dimînin û paşê dema çavên wan bi çilekiyekê dikeve difitirin. Min heta nîvro bi xwedê ne tenê zarok dê û bav jî heta piştî nîvro di xew de ne û heta ku radibin mala xwe didin ser hev û xwarina fitarê amade dikin ji xwe mele azan dide û dibe wextê fitarê.

Min behsa zarokan û rojiyê kir zaroktiya min hat bîra min. Di zaroktiya min de melayekî gundê me hebû, navê wî Mele Evdile bû. Ew mirovekî welatparêz û gelekî henekçî jî bû. Carekê min jî got min rakirin paşîvan û qaşo ez ê jî rojî bigirim. Min heta nîvro qedand lê ez hem tî û hem birçî bûm. Diya min rehma xwedê lê be tê derxist ku ez birçî bûme, rabû ji min re got; kurê min rojiya zarokan heta nîvro jî çêdibe sibe jî ewqasî bigire û paşê wê xalê te mele ji te re bi ser hev veke.

Min jî bi kêfxweşî zikê xwe da ber xwarinê û roja din jî wiha kir. Paşê ez çûm ba xalê Mele Evdile û min jê re got; xalê mele 2 rojê min heta nîvro qediyan û diya min got biçe bila xalê te mele wan bi hevre bidirû.

Xalê mele got tamam lê wiha nabe, divê tu biçî sênîkek mewîj bînî da ku ez rojiya te bi ser hev vekim. Ez vegeriyam malê û min sêniyeke mewîj bir ji mele re. Mele keniya û got tamam îca çêbû tu biçe ez ê rojiya te bi ser hev vekim.

Îca heke em vegerin ser pirsa xwe ya gelo Remezan jî ji me razî ye yan na, wê gavê divê em bala xwe bidin ser van tiştan. Rojî ne tenê parastina ji xwarin û vexwarinê ye. Heke em mafê xelkê bixwin, zilm û tadayê li xelkê bikin, em bi nebaşî ji mirovan xeber bidin, em tilêra zikê xwe têr bikin û cîranê me birçî be wê gavê em ne ji sibê heta êvarê lê em 30 rojî li ser hev jî xwarinê nexwin ew nabe rojî û nayê qebûlkirin. Kesên li gor wan şert û mercan rojiya xwe digirin, Xwedê rojiya we tevan qebûl bike û kesên zilm û zorê li mirovan dikin xwedê xêra rojiya wan bike ka û bi ser serê wan da bike.

# Klamek Ji Bo Beko

**Ferat Kevir**

Vê carê ez ê hewl bidim berê we bidim fîlmekê ku gelekan ji we an ji bîr kiriye an jî hê haya we jê nîne. Min di nivîsa xwe ya 'Hevnasîna Kurdan û Sînemayê' de jî qal kiribû bê ka kurdan kengî û bi çi awayî hunera heftemîn a cîhanê (sînema) nas kiriye. Em nêzî 90 salî bi paş de çûbûn û me qala fîlma Zerê ya derhênerê ermen li çiyayê Elegezê li ser kurdan çêkiriye kiribû. Ez ê vê carê 28 sal bi paş de biçim. Ez ê dîsa berê xwe bidim çiyayê Elegezê. Mijara me dîsa kurd in lê vê carê derhênerê me jî kurd e. Ez bawerim we fîlm texmîn kir. Navê fîlma me 'Klamek Ji Bo Beko' ye. Ez baş li ser vê mijarê hûr bûm û min dît ku di navbera fîlma Zerê û Klmek Ji Bo Beko de 65 sal heye û piştî 65 salan qedera sînemaya kurdî dîsa li çiyayê Elegezê vedigerê. Şert û merc an jî derfet çawa bin jî mesele ew e ku devereke weke çiyayê Elegezê bi her awayî ji dîrok, çand û hunera kurdan re bûye wargeh!

Fîlm ji hêla mûzîkjenê kurd Nîzamettîn Arîç ve di sala 1992'yan de hatiye çêkirin. Ew bi xwe him derhêneriya fîlmê kiriye him jî lîstikvanê sereke ye. Senaryoya fîlmê jî wî û Christina Cheiniz bi hev re nivîsandiye.

Fîlm weke li Kurdistanê derbas dibe, lê dever Ermenistan e û gundên kurd lê dijîn e. Birayê Beko Cemal ji ber eskeriya tirkan berê xwe dide çiyayên Behdînanê. Piştî ku Cemal bi hespa xwe ji gund derdikeve eskerên tirkan bi ser gund de digirin û Beko bi xwe re dibin. Di rê de pevçûn diqewime û Beko xwe ji nav lepên eskeran xilas dike û dikeve pey şopa birayê xwe.

Fîlm di gera Beko ya birayê xwe de rewşa kurdan û Kurdistanê ji me re rawe dike. Beko di serî de bi serê xwe bi qeçaxî ji Bakur derbasî Rojava dibe. Dixwaze ji Rojava jî derbasî Başûr bibe. Di vir de em parçebûna axa kurdan bi awayekî zelal dibînin. Kurd ji devereke welatê xwe bi qeçaxî derbasî devereke din a welatê xwe dibin. Em dîsa dibînin ku parçebûna welat bi xwe re parçebûna malbatan jî tîne. Ji hêlekê ve endamên malbatan dixwazin vî welatî bi hev ve bikin û di encama vê tevgerê de jî malbat belav dibin. Yanî parçebûn bi xwe re belavbûnê tîne. Di serê fîlm de jî birayê Beko ji ber heman sedemê berê xwe dide çiyayan. Em ê di fîlmê de vê parçebûnê pir caran bibînin.

Beko di gera birayê xwe de tê heya zozanên Başûr. Lê di vir de asê dimîne û dibe mêvanê zomekê. Sedema asêmayîna wî jî dîsa şer e. Vê carê şer şerê Îran û Iraqê ye lê dîsea jî yên ji şer bi bandor dibin kurd in. Ji ber ku şerê her du dewletên dagirker li ser xaka Kurdistan diqewime!

Di mêvandariya Beko de em li ser çiyayan kurdên ji bajarên xwe ji ber şer derketine û xwe spartina çiyayan dibînin; jin û



Fîlmê Klamek Ji Bo Beko ji bo sînemaya kurdî filmeke serkeftî û girîng e. Lê fîlm di nav atmosfera sînemaya kurdî de kêm tê naskirin û heqê fîlm nayê dayîn

extiyar, pêre jî zarokên bê dê û bav mane. Parçebûna ku bi xwe re belavbûnê tîne dîsa derdikeve hemberî me. Çiya dîsa dibine dostên kurdan.

Zeyno karektereke din î sereke ya fîlmê ye. Jineke ji xwe ewle û zîrek e. Wek berpirsiyara zomê tevdigere. Di şevbihêrkan de pêşkeşiyê dike. Zeyno di nav şert û mercên zomê de peyvirekê dide Beko û ew dike parçeyek ji zomê. Berê Beko dide zarokan.

Neh deh zarok di bin çardaxekê de dersa ziman dibînin. Piştî navberê Beko bi zarokan re tekilî datîne û wan bi taybetiyên wan dide naskirin. Her yek ji Beko re qala taybetiyên xwe dikin. Yek baş dikare strana bêje ya din çîrok, yek tevgerên jîmnastîkê dike ya din li bilûrê dixe. Lê her yek ji wan ji ber parçebûna ku belavbûn bi xwe re aniye li ser wan çiyayan li benda qedera xwe ne! Derhêner dibêje ku heger welatekî azad ê wan zarokan hebûna wê ev zarok ne li serê van çiyayan bûna. Wê li dibistanên xwe perwerdeyê bidîtana û bi van qabiliyetên xwe wê welatê xwe bi rê ve bibirana! Û wê ew welat kiribana taca cîhanê!

Zîna bêdeng di nav koma zarokan de bala Beko dikişîne. Beko dixwaze Zînê nas bike. Pêre henekan dike lê bes tramvaya Zînê di serî de rê nade henekên Beko. Zînê di bêkesiya xwe de asê maye û hevaltiya xwe bi kûsiyekî extiyar re daniye û xwe ji jiyana rasteqîn û ew bê dê û bav hiştiye dûr xistiye. Mixabin çîroka Zînê wek karekter piştî vê fîlmê di gelek fîlmên din de jî bûye mijar!

Di şevbihêrkê de çend malbat biryar didin ku vegerin gundê xwe. Pîra Zeynoê biryara çûyînê ji wan re dihêle. Roja din malbat ji zozanan berê xwe didin gundê xwe. Zîna biçûk di xatirxwestinê de diçe cem Beko û doza hatina wî ya bi xwe re dike. Beko dilê Zîna dilşikestî careke din naşikêne û dide pey xwesteka wê.

Dema gundî li warê xwe vedigerin gundê xwe wêran dibînin. Şerê ku ne yê wan e gundê wan welatê wan wêran kiriye. Gundî hewl didin gundê xwe ji nû ve deynin û jiyana xwe berdewam bikin. Beko di nav xaniyên wêran de li elamtên jiyanê digere! Piştî demekê bêhna Sêvan li çiyayan belav dibe. Dengê teyareyan li ezmanên gund olan dide. Beko bi bazdan diçê bi aliyê Zîna biçuk de. Dîmenê Helepçe yê ku bêhna Sêvan mirin lê belav kiribû tê ber çavên me. Gundiyên ku xwe ji zozanan berdabûn gundê xwe niha her yek ji wan bi bêhna Sêvan a jahrkirî di nav xerabeyê gunde xwe bê ruh dirêj kirine. Beko yek bi yek diçe ser wan. Di nav wê xerabeyê de Zîna biçûk î bê siûd dibîne.

Di dîmenê dawî ya fîlmê de Zîn li nexweşxaneyê ye û Beko hewl dide here hevdîtina wê. Wisa xuyaye ku di êrîşa Helepçeyê de Zîn birîndar bûye. Vê carê parçebûna belavbûnê bi xwe re tîne derbeke mezintir li Zîn û Beko daye. Zîn birîndar e û bi Beko re bi temamî ji welat dûr xistiye. Belavbûn aniye asta Ewropayê. Erê êdî Beko dev ji her tiştî berdaye û xwe bi Zînê re spartiye hêlîneke ewle!

Ya rastî Beko di serê fîlmê de doza çûyîna Ewropayê ji birayê xwe dike lê bes bira qebûl nake. Li zomê di suhbeteke bi pîra Zeynoyê re jî vê meseleyê vedike lê bersiv dîsa eyniye; çi bibe bila bibe ev welat yê me ye, em jê dernakevin.

Film di mijara xwe de Kurdistanê û arîşeyên wê hemûyan dihewîne. Li gor lîteratura sînemayê ev ji bo fîlmekê tiştekî qels e. Her wiha em dikarin ji çîroka fîlmê çar pênc fîlmên din derxin. Dibe ku derhêner xwestiye bi derbekê de bi fîlmekê her tiştî rave bike lê bi fîlmek tu carî têrî rawekirina rewşa Kurdistanê nake. Lê dîsa jî fîlm temaşevanan aciz nake. Di xeta xwe de baş diherike.

Lîstikvaniya Beko û yên derdora wî jî li gor dem û derfetan serkeftî ye. Lîstikvanî û derhênerî bi hev re ne hêsan e. Bêguman baştir jî dibû lê dîsa jî derhêner ji bin vî barî jî derketiye.

Ji bilî muzîka dema esker Beko digirin û Beko xwe ji wan xilas dike muzikên fîlmê jî serkeftî ne.

Di honandina fîlmê de hin xeletiyên bingehîn hene. Car caran Beko diçe zemanê berê û vedigere. Bikaranîna vê metodê heger hêzê nede honandinê wê demê mijarê li nav hev dixe û serê temaşevan tevlihev dike. Di çend dîmenên Zînê û Cemal de em vê rewşê dibînin.

Fîlm bi çend taybetiyên xwe hin hîmên rasteqîniya nû ya îtalî jî dihewîne. Çîroka fîlmê û dema fîlm tê re derbas dibe dema şer e. Wekî din lîstikvan amator in û ji nav wê rastiyê hatine bi awayekî din lîstikvan bi rastî ev mijar jiyane! Fîlm bi dîmen û çîroka xwe xwestiye rastiyekê rave bike û ev taybetî jî xwe dispêre rasteqîniya nû ya îtalî.

**Wek encam**

Fîlma Klamek Ji Bo Beko ji bo sînemaya kurdî filmeke serkeftî û girîng e. Gelek fîlmên îro bi teknîk û derfetên baş hatine çêkirin wek vê fîlmê nabin! Lê dîsa jî fîlm di nav atmosfera sînemaya kurdî de kêm tê naskirin û heqê fîlm nayê dayîn. Kurd li curbicur deverên Kurdistanê festîvalên girîng li dar dixin lê mixabin fîlmê nakin bernameya xwe û nadin nasîn û temaşekirin.

Ya girîntir ew e ku fîlm ji bo destpêka sînemaya kurdî bingeh e. Heger em xetekê ji bo dîroka sînemaya kurdî diyar bikin li gor min fîlma Zerê wek pêşîn derdikeve pêşiya me. Piştî fîlma Zerê Yilmaz Guney tê. Wek destpêka nû yan jî salên dawî yekem fîlma bi her awayî sînemaya kurdî temsîl dike fîlma Klamek Ji Bo Beko ye.

## Bahol

*Şengul Ogur*

Kaba xwe ya çepê ber bi xwe ve şikandiye, daye ber sînga xwe û sînga xwe spartiye ser û ji newqê û jortir bi pêş de hinekî xwehr bûye. Kaba rastê jî şikandiye, paqa wê ji aliyê rastê li ser erda rût û sar e, lingê xwe hinekî ber bi xwe ve kişandiye. Li ber wê baholeke mezin î reş heye û xwe bi ser de tewandiye. Dema ku destê xwe ber bi baholê ve avêtiye pişta wê xûz bûye û hestîkên laşên wê yek bi yek xuya dikin.

Devê baholê vekiriye. Kinc di baholê de hene. Kincên bi rengê spî, reş, kesk, sor, xemrî. Gore hene, goreyên biçûk, etekên biçûk, qutîkên biçûk. Her wiha kincên mezinan jî di nav baholê de hene. Lê kincên bicûk û yên mezin ji hev hatine veqetandin, her çi qasî di eynî baholê de jî bin.

Di destên wê yên ziravik, bêrih de etekeke biçûk heye, etekê zaroyeke pênc şeş salî. Wilo di cihê xwe de sekinî maye. Ne weke ku bi kincekî bigire etek girtiye; bi rengekî wiha bi etek girtiye, mirov dibêje qey ya di destê wê de ne etek, ne kincek e, zaroyeke bi goşt û hestî ye, bi rih û can e, wilo bi hezkirinekê bi etek girtiye.

Berê çavên xwe daye ser eteké, lê berê awirên wê mirov dibêje qey li ser zarokekê ye û li nav çavên wê dinêre, bi hezkirineke ku mirov bixwaze hemêz bike lê nema karibe hemêz bike.

Destên wê wiha sekinîne, tu dibêjî qey etek di seriyekî re hatiye kirin û serê zarokekê difirikîne, dema ku mirov dêhna xwe dide serê qermîçokên li kevîkên çavên wê, devê wê yê li ber vekirinê wiha xuya dike, weke ku wê biaxiviya lê tam dema ku wê biaxiviya zimanê wê neqelibiye, bedena wê tevde bûye weke zimanekî.

Li rex baholê rûpeleki rojnameyeke bi kurdî heye. Tarixa li ser rojnameyê 1'ê Mijdara 2019'an e. Di wî rûpelê rojnameyê de wêneyê keçeke biçûk heye. Di bin wêne de tê gotin: "Li Rojava keçika şeş salî hate kuştin!"

Hevokên dawî yên nûçeyê di rûpela rojnameyê de: "Kincên min û keça min di baholekê de ne. Ez kincên keça xwe ji kincên xwe venaqetînim, tim di eynî baholê de ne. Ji ber ku heke ez veqetînim bi min wiha tê weke ku keça min wê ji min qut bibe."

## Malpera Enstîtuya Kurdî bi hemû zaravayan dest bi weşanê kir

Malpera Komeleya Lêkolînên Kurdî bi zaravayên kurdî yên kurmancî, soranî, kelhorî, hewramî kirmanckî, lekî û lorî dest bi weşanê kir.

Komeleya Lêkolînên Kurdî piştî ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji hêla polîsên dewleta tirk ve hatibû girtin, hate damezirandin. Komele wek berdewama Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê xebatên xwe didomîne.

Li gel her heft zaravayên zimanê kurdî, her wiha malper bi îngilîzî û tirkî jî dê weşanê bike.

Navnîşana malperê wiha ye: www.komeleyakurdi.org



# xwebûn

18-24 Gulan 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 22

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.



Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85


# Tofaneke bê Nûh: Heskîf


Navenda Nûçeyan


**Cih û warê dîrokî Heskîf îro wek tofaneke Nûh e lê vê carê keştî tune ye. We wêneyê mizgeftê dît (li Heskîfê) ji bo di bin avê de nemîne bi minasebeta projeya Bendava Ilisûyê ji cîhê xwe bi wesayiteke taybet hat vegûhastin. Min ji xwe re got gelo ev keştî ye?**

Anna Ellermets û Lou-Poko Savadogo li Parîsê dijîn û dixebitin, xwendekarên dibistana avahîsaziyê ne, ew di xebata xwe ya bi navê " A. Floating G.A.P." de, li Heskîfê li ser têkiliyên di navbera bîr û veguhastina avahiyan de dixebitin.

Navê vê axa niha perçe dibe, Mezopotamya kevnar e, bi yewnanî Meso "di navbera" û Potamós "çem", tê wateya welatê "di navbera çem" de. Mezopotamya dergûşa xewn û xeyalên me ye, çemên Dîcle û Firatê axa Mezopotamya û çîrokên wê yên mîtolojîk bi hev re kedî dike, di heman demê de jî bi pêlikên xwe yên zexm vê axê diparêze. Tiştê me li başûrê rojhilata Tirkiyeyê dît çemên “dîl” girtî ne. Pêkanîna bendavan li ser Dîcle û Firat ji hêla hikûmetê ve wek Projeya Mezin a Anatoliyayê ( G.A.P.) ji 22 bendavên pêk tên û xetereya zêdebûna avê çêdikin. Bi girtina avê re, bi sedan gund di bin avê de dimînin û ev jî dibe sedema binavbûna bermayiyên şaristaniyên kurd, ermen, keldan, grek û asûr...

Em vê binavbûna şaristaniyê dişibînin çîroka herî kevnar a mirovahiyê ku navê wê tofana Nûh e. Xebata li ser vê projeyê şahidiya mekanîzmayên dewleta neteweya-tirk dike.

Dema em li çîroka neteweya mezin a Tirkiyeyê dimeyzînin, înkarkirin û qetilkirina cihên amblematîk, çandên hûrgelan û wendakirina çîrokên hevpar ên şaristaniyê dibînin. "Edî tenê dema mîtolojîk di rojên peş de mumkun e " ji bo wê jî em hîs dikin ku hewceyî bi cihekî ji bo ragihandinê heye. Li Floréal Belleville, me pêşengehek vekir. Ji bo em û hûn xeyalên xwe parve bikin, têkevin nav keştiyê û bîranîna van civakên me bi wan re hevdîtin çêkirine bi hev re bivejînin. " Ji bo projeya "A. Floating G.A.P.", em bi hunermend, muzîsyen, şanoger û rojnameger re hevkariyê dikin.

**Li gel Aram Taştekîn**

Em bi Aram re li mala nivîskaran a Parîsê hatin cem hev. Aram lîstikvanek e, piştî hevdîtina me ya duyem em bûn şahidê hezkirina wî ya çîrokan û çîroka wî. Aram çîrokbêjek e, ew çîroka xwe dilîze, wê di provayan de diguherîne û bi awakî hosteyî cewhera wê diparêze.

Aram niha bi Peter Brook re li ser lîstika “La Tempête”( Tofan ) ya Shakespeare” dixebite.

Ev şanonameyeke ku derhêner bi salan ne wê diguherîne û me jî bi xwe re dike şahidê vê rêwîtiyê. Brook, ji me re li ser rezonansê diaxive, qala bandora tiştên di mêjiyê mirov de deng vedidin û bi awayekî rasterast nayên dîtin dike, li gel karakterê veşarî û vê tevliheviyê jî Brook bi awayekî hostayî derdixe holê û pêşberî me dike û nîşan dide ku çiqas bi bandor e.




**Aram Taştekîn ( A.T) :** Gundê me li qûntara çiyê ye. Li pişt gundê me çiya destpê dikin, hin newal û milên çem jî di gundê me de derbas dibin, ava wan bi helandina berfa biharê re zêde dibin. Dema ava çem zêde dibe em nikarin bi hêsanî li avê xin û derbasî hember bibin. Piştî demekê av di newalê de namîne, tenê ji bo pez hinek av di bin de dimîne ewqas. Lê tê bîra min dema em zarok bûn, derdora meha gulanê, dema hewa xweş dibû em diketin avê û me tê de avjenî dikir. Piştî demekê, ava newala ziwa bû û ev jî her tim ji min re dibû meraq. Min digot herhal berf wek berê nabare û ev jî dibe sedema ziwabûna newalê. Dema ez zarok bûm tê bîra min berfeke pir dibariya. Lê min bi dîtina bendavê hezir kir ku berf diviya baş bariyabe. Ev tenê nêrîneke cuda ye, wexta ez zarok bûm, berf bi ser serê me diket, îro berf ber çavê me nakeve. Lê berf her tim dibare. Rast e, dema em bala xwe didinê ji 20 sal berê hindiktir dibare; lê ev bi tena serê xwe têra ravekirina nebûna avê nake. Ev dûrî aqilan bû. Dema av tunebe, ev qet li xweşa min naçe û ji dilê min nayê derkevim nav xwezayê. Ev çend sal in min dît ku di nav xwezayê de liv û tevgerek nîne, ev ne xweza ye. Ez dixwazim ku berf, baran, ba û bahoz hebe. Bi vî awayî ez ê bizanibim, hîs bikim ku xweza heye. Dema ez di xwezayê de tevgerekê nebînim , ji min re wer tê ku ez ne di bihuştê ne jî di dojehê de me. Ev rews ne di dojehê de ne jî di buhuştê de heye, di nav her du yan de ye, ez vîna wek rihê zivistanê li penabertiyê bi nav dikim. Bendavên di çarçoveya projeya GAP’ê de tên çêkirin dibin sedema koça bi hezaran kesan. Ev bendav dibin sedema penaberiya gelek kesan. Ev ji cih û warên xwe bûn hemû bi dare zorê pêktên. Dawî li her tiştî anîn. Ji bo min bi rastî jî piştî avakirina bendavan li Kurdistanê jiyan nema û ji xwe tuneye jî.



**Bendav hepiskirina avê ye**

Li cem me bêjeyek heye, “Av dihêrike û rêya xwe dibîne". Îro av nema rêya xwe dibîne ji ber ku ew hatiye hepiskirin. Hemû ajal, nebat li ber dikevin û dimirin. Xweza tê guhertin. Ji ber vêya ye ku îro berf hindik dibare, bi avakirina bendavan îklîma herêmê diguhere hêmiya hewayê jî zêde dibe. Tê bîra min germa nav rojê carna derdiket 45-50° dereceyî lê li gel vêya jî wexta dibû êvar em li ser baniyan radizan hewa sar dibû û me lihêfê davêt ser xwe. Di navbera şev û rojê de 20° derece hewa ferq dikir, îro ev daketiye 10° dereceyan, ev jî ji ber hebûna bendavan e. Me kêmasiya avê nedikişand ji ber ku gundê me nêzî çiyê bû li her alî avên kaniyan hebûn ji her cihî av dipijiriqî.

Baweriya min bi mîtolojiyê pir tê. Dema em li ser mîtolojiyê hûr dibin (dixebitin) em nikarin bêjin ev rast e an jî çewt e. Dema tu bikevî dû vê pirsê ev mît dimire. Ev rast e an na ? Bi lêpirsîna vê pirsê mît dimire. Helbet hêla xwe ya teknîkî rêk û rêbazên wê hene lê li gor nêrîna min mîtolojî bûyerek ku di nav dîrokê de derbas bûye û di dîrokê de xwe bi cih kiriye. Dema çîrokek ji hêla mirovahiyê ve tê qebûlkirin wê demê di nav civakê de bi cih dibe û ew çax dibe mît. Em napirsin bê kengê ? Çawa ? Li ku ? Bêyî ku em van pirsan bipirsin, dipêjirînin. Ji bo min eva ye ku em jê re dibêjin mîtolojî. Ji ber vêya ye ku em dibêjin “mît” ji dêvla ku em bêjin “ev çewt e, ev ne pêkan e”. Em dizanin ku hin tişt qewimîne derbas bûne, lê çawa ? Ev ne girîng e, herkes li gor hêza jiyana xwe ya xeyalî wate didê. Destana Gilgamiş mîtek e lê ez ji gişî bawer dikim. Ji bo min wek Incîlê wek Quranê ye. Ji bo min ol jî mîtolojî ne, lewma her çiqas ez ne yekî bawermend bim jî ji hemûyan bawer dikim, ev jî ji baweriya min a bi mîtolojiyê ye. Eger ez nizanibim bê çend milyon kes jê xeber dide, tê wê maneyê ku ew heye û em dikarin wê qebûl bikin. Herkes fikreka xwe, baweriyek xwe heye, yê min baweriya min bi hemû olan heye. Lê ez ne bawermend im. Her wiha ji bo mîtolojiyê jî, ji bo min her rêzek ji Destana Gilgamişî wek ayetek e.

**Anna. E. & Lou-Poko. S :** Niha ku em li ser Tirkiyeyê diaxivin ji mirov re wer tê ku ev meriv di nav dîrokek mîtîk de dijîn.

**A.T :** Rast e. Heskîf îro wek tofaneke Nûh e lê vê carê keştî tune ye. We wêneyê mizgeftê dît (li Heskîfê) ji bo di bin avê de nemîne bi minasebeta projeya Bendava Ilisûyê ji cîhê xwe bi wesayiteke taybet hat vegûhastin. Min ji xwe re got gelo ev keştî ye? Dûvre min go na na ev ne ew e. Ez ne şaş bim Karl Marx dibêje ; dîrok wek çemberê ye û her car xwe dubare dike, cara yekem trajedî ye û ya duyem jî komedî ye. Çemberek di her 100 salî de em heman tiştan tê de dijîn. Heskîf yek ji bajarên herî kevnar ê cîhanê ye ku xwedî dîrokek 10 hezar salî ye. Heskîf bi zinarê xwe yên kils, bi hezaran şikeftên xwe, bi qasî 300 berhemên xwe yên serdema navîn di nav xwe de ekosîstemek bêhempa ye. Di bin gola bendavê de gelek şikeft û avahî di bin avê de man. Zêdeyî 20 şaristanî rêç li pey xwe hiştine. Niştecihên wê derê bi îhtîmaleke mezin di nav şikeftên ber berî Dîcleyê ve rêz dibin de jiyane. Heskîf dûvre, di destpêka serdema navîn de dibe navendeke girîng a bazirganiyê ku li ser rêya hevrîşimê pêk dihat. Di nav wan avahiyan de wek bermayiyên qesra Artûkî, mizgefta El Rizq û tirba Zeynel Beg hene. Derdora 200 sîtên arkeolojîk ji ber bendava Ilisûyê zirarek mezin dîtine lê Heskîf di nav van sîteyan de bi cih û avahîsaziya xwe cihekî taybet digire. Her wiha yek ji sîteyên serdema navîn ku heta niha li Tirkiyeyê herî baş hatîye parastin e. Dewleta tirk heta niha ji 300 avahiyan tenê 12 avahî veguhastine û li cihekî nû bi cih kirine. Hin perçên avahiyan di dema veguhastinê de şikestine ev jî bû sedema windabûna hin detayên xwe yên orjînal. Li gel avahiyan şikeft, bermayî, rêç û hwd. di bin avê de man û ji holê rabûn.

Heskîf niha komedîyek e. Ji destpêkê ve dema tiştên li Heskîfê diqewimîn difikirîm, ji min re wek tofana Nûh dihat. Min digot kanê keştî ? Dema min wêneyê veguhastina avahiyên dîrokî yên Heskîfê dîtin, min ji xwe re got ku ev keştîyek e û hatiye me rizgar bike. Lê pêre ez ji van fikrê xwe dûr ketim û min got ku ev ne keştî ye. Ez bi vê rewşê dikenîm, tevî ku ev çîrokek pir xemgîn e jî ev min dide kenandin.

**Ax welatê min…**

Çima min dide kenandin ? Ji ber ku absurd e. Ev absurdî ye ku ez dam kenandin. Ew me carna dikenîne. Ji bo gelek kesan şanonameya min a bi navê "Happy Dreams- Çîrokek Kurd" pir komîk e. Lê belê di dema provayan de min xwe li nexweşxanê dît. Ez hefteyekê li nexweşxanê li beşa psîkiyatriyê raketim ji ber ku tiştên min jiyabûn dihatin ber çavên min û tehamula ev yek jî gelek dijwar bû. Berê dema min ev zehmetî dijiyan, min ferq nedikir ku ev çendîn zor e; ji ber ku min li ber xwe dida. Wexta tu li ber xwe didî tu li ser xwe yî. Em dibêjin berxwedana herî baş êrîşkirin e, tu ji xwe re dibêjî niha ez di êrîşê da me ji bo xwe biparêzim. Hemû tişt carekê ku min ji nû ve dest bi nivîsê kir hatin serê min. Min dest bi provayan kir, her cara min dubare kir, ez carek din bi buyerên trajîk re rû bi rû mam. Gava min ew qebûl kirin, ev bûyer komîk bûn, ji bo min jî bi heman rengî xuya kir.

Niha ez li Parîsê dijîm. Taqeta êrîşê di min de nîne; ti tiştek ku ez êrîş jî bikim nîne, ez ne Don Kîşot- « Don Quichotte » im. Tistê niha diqewime ne komedîyek e, ev trajedîyek e lê bi absurdiya xwe veduguhere rewşeke komîk, ji ber ku mêjiyê me hînbûyî vê rewşê ye, em şoke nabin. Ji ber ku em mîtê nas dikin, em li bendê ne ku herdu çîrok bigihên hev; lê na, ew bi heman şêwazî bi dawî nabin.

Bi rastî jî min got qey ev karaketa tofana Nûh e û ez li keştiyê digeriyam.

Dema tu vêya dibînî tu dibêjî gelo ev keştî ye ?

Na ev qet ne keştiyek e.

Ev çi ye ewçax ?

